Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1385 | 14-Pûşper-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Yekemîn Festîvala Şano Ya Zarokan Li Rojava wê were lidarxistin

**Zana Roj/Qamişlo**

**Endama Komîteya Amadekar a Festîvala Şano Ya Zarokan li Rojava Zîlan Mecîd da zanîn ku her çiqas xebatên hunerî û çandî bo zarokan hatine lidarxistin, lê ev yekemîn festîvala şano bo zarokan e û got, "Zarok nifşên pêşerojê ne ku wê mîrateyên xwe yên kevnar biparêzin."**


Festîvalê Zîlan Mecîd ji Rojnameya me re axivî.

Xebatên zarokan ji bo bihêzkirina jêhatî û çalakiyên wan li Rojavayê Kurdistanê her hatine organîzekirin û birêxistinkirinm. Bi taybet xebatên hunerî û çandî li hemû navendên çand û hunerê li herêmê zarok bûne beşa herî girîng. Ev xebat bi armanca parastina çand û kultura Kurdewarî ji nifşekê ta nifşşekê hatiye kirin. Li Rojavayê Kurdistanê wê Yekemîn Festîvala Şano a Zarokan di dîroka 16 û 17'ê heyva Pûşperê de wê were lidarxistin. têkildarî organîzekirin û birêxistinkirina vê festîvalê yek ji endamên Komîteya Amadekar a

### Yekemîn Festîvala Şano a zarokan li Rojava

Zîlan di destpêka axaftina xwe de bal kişan ser festîvalê û amadekariyên ku ji bo wê têne kirin û wiha anî ziman: "Xebatên hunerî û çandî ji bo zarokan di herêmê de her tim hebûn û berdewam dikin, di hemû navendên çand û hunerê de beşên taybet ên zarokan hene, yên stran, govend, amûr, şano û hwd. Helbet xebat û çalakiyên çano her hebûn, lê bi awayekî festîval nehatine birêxistinkirin. Şanoyên zarokan



di gelek çalakî û li bajaran hatine pêşkêşkirin, vê carê jî me xwest em weke yekemîn festîvala şano a zarokan li rojavayê Kurdistanê bidin destpêkirin.
Amadekarî di destpêkê de bi gera li ser navendên Çand û Huner ên bajaran hate destpêkirin, bi armanca ku em komên şano yên zarokan ên hene û têne perwerdekirin bibînin, amadekarî û proveyên wan yên li ser şano werin şopandin, hejmar û naveroka şanoyan ku gelo dikarin di lîstikên nû de kar bikin, ev hemû hatin kirin da ku ev kom ji festîvalê re bêne amadekirin. Piştre biryara lidarxistina festîvalê hate dayîn. Heyanî niha nêzî 7-8 komên şano ên zarokan hene, lê belê biryara dawiyê ku wê tevlî bibin an na hê nehatiye dayîn. Helbet sînaryo ji komîteya amadekar re hatin şandin ku ev naverok û çîrok ji bi zarokan guncaw in an na. Wê festîval di dîrokên 16 û 17'ê Hezîranê de were lidarxistin.

### 'Çand û huner bi zarokan, parastî dimîne'

Zîlan di domdariya axaftina xwe de armanca ji lidarxistina vê festîvalê anî ziman û wiha got: "Her çalakî û xebatekî ji bo zarokan tên kirin, girîngiyeke wê ya pir mezin û taybet hene, lê mi-



xabin em gelek girîngiyên didin xebatên ciwan û mezinan, lê em girîngiyê nadin jêhatî û çalakiyên zarokan. Ji ber wê jî divê em van jêhatî û hewildanên wan yên ji bo pêşketinê, em piştgirî bidinê û pêş bixînin. Di heman demê de gelek nameyên me hene ku em dikarin bi rêya zarokan derxînin û bidin, zarok bi taybet di aliyê parastina çand û hunerê de, ew rola herî girîng dilîzin, ji ber ew in nifşên pêşerojê ku wê mîrasên xwe yên kevnar biparêzin. Di heman demê de zarokên me bikaribin di rêya hunerê de xwe îfade bikin û mijarên civakî yên ku bibin naveroka şanoyan, wê bêhtir bandorê li ser wan û hemû tameşevanan bike."

### 'Festîval; wê bibe bingehek ji zarokan û xebatên me re'

Endama Komîteya Amadekar a Festîvala Şano a Zarokan Zîlan Mecîd di dawiya axaftina xwe ev anî ziman û got: "Festîvaleke zarokan a salane ya zarokan di heyva Îlonê de tê lidarxistin ew jî vestîvaleke zêetir wêjeyî ye û pir xweş e. Ev festîvala Şano jî wê bibe bingehek ji bo hemû zarokên ku xwediyên jêhatî û hezkirina xwe ya ji şanoyê re. Ne tenê ev wê di heman demê de ji bo xebatê me yên şano û zarokan jî bibe bingehekî xurt ji pêşerojê re."

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ji gur birçîtir e ji mar tazîtir e:**
-Rewşa wî ya aborî pir nebaş e; tiştek di mala wî de nîne.
**Nemirnejîn e:**
- Rewşa wî ya aborî ne pir baş e; bi zorê debara xwe dike.
**Serî lê geriyaye:**
- Rewşa wî ya aborî pir xirab e; perîşan bûye.

**LI SER WIJDANÊ**

**Bûkê ziman nîne xesûyê îman nîne:**
- Yek bêderfet e, yê din jî bêmerhemet e; yek tiştek ji destê wî nayê, yê din derfetên wî hene lê alîkariyê pê re neke.
**Bûka bêziman, xesûya bêîman:**
- Bi heman wateyê.
**Destê xwe dayne ser dilê xwe:**
- Rast biaxive; biwijdan be.
**Guneh e:**
- Dilê min pê şewitî; ez li ber ketim; dilê min ma pê ve.
**Gunehê min pê hat:**
- Bi heman wateyê.
**Gîsk ket destê kevaniyê salê heft caran qusand:**
- Bêinsaf e; bêrehm e; kî dikeve ber destê wî ruhê wî distîne.
**Her kes û şîrê xwe:**
- Divê mirov biwijdan be. Miyê xwedî dike û gur nîşanî dike:
- Nahêle ne bimire ne bijî.
**Tu û şîrê xwe:**
- Li gorî wijdana xwe bike; min hiştiye bi hêviya wijdana te ve. Ezê li gorî wijdana xwe bikim, tu jî li gorî wijdana xwe bike.
**Tu û şîrê xwe, ez û şîrê xwe:**
- Bi heman wateyê.
**Xwe ji dîn û îman kir:**
- Bêwijdanî kir.

**LI SER DEVJÊBERDAN, RAWESTANDIN Û DESTKIŞANDINÊ**

**Destê xwe jê kişand:**
- Dev jê berda; xwe ji nava wî karî derxist; xwe ji navê da aliyekî; têkiliya xwe ji wî karî birî.
**Destê xwe ji dinyayê kişandiye:**
- Dev ji komkirina malê dinyayê berdaye; karê xêrê dike; êdî tevlî karê ti kesî nabe; xwe daye îbadet.
**Destê xwe ji karê dinê şûştiye:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Sudoku: Bersiv 78

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 8 | 4 | 7 | 1 | 2 | 9 | 6 | 5 |
| 1 | 9 | 5 | 6 | 4 | 8 | 7 | 2 | 3 |
| 2 | 6 | 7 | 5 | 3 | 9 | 8 | 4 | 1 |
| 9 | 3 | 2 | 4 | 8 | 5 | 6 | 1 | 7 |
| 8 | 4 | 6 | 1 | 9 | 7 | 3 | 5 | 2 |
| 7 | 5 | 1 | 3 | 2 | 6 | 4 | 9 | 8 |
| 6 | 7 | 9 | 2 | 5 | 3 | 1 | 8 | 4 |
| 4 | 2 | 8 | 9 | 7 | 1 | 5 | 3 | 6 |
| 5 | 1 | 3 | 8 | 6 | 4 | 2 | 7 | 9 |

Sudoku:Pirs 79

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 1 | | | 7 | 3 | | | |
| 9 | | | | | | 2 | | 3 |
| | 3 | | 4 | 2 | | | | |
| | 6 | | 5 | 8 | | | 9 | 7 |
| | | | | | | | | |
| 1 | 9 | | | 6 | 2 | | 8 | |
| | | | | 4 | 1 | 2 | | |
| 6 | | 4 | | | | | | 5 |
| | | | 2 | 9 | | | 3 | 6 |

## Zêdebûna kolandina bîrên bêserûber û xeteriyên wê



Ji ber kêmbûna avê di salên borî de û ji bo peydakirina avê, diyardeya kolandina bîrên bêserûber di nava kolanên bajarê Qamişlo de zêde bûye. Ev yek jî dibe ku gelek metirsiyan bi xwe re bîne; wekî kêmbûna asta ava binerd û belavbûna nexweşiyan ji ber neguncavbûna cihên kolandinê.**R-8**

## Jina ciwan ku di temenê xwe yê biçûk de pirtûkek îmze kir



Jina ciwan Yasmîn Ebas ku ev yekemîn care pirtûkekê di temenê xwe yê biçûk de bi hêz û hezkirinekê çap dike. Xwesteka Yasmîn jî ji pirtûkê re ew e ku her nifşekî nû sûdê jê bigire.**R-9**



## Xalid Omer: Divê destûra sabit bi beşdariya wekhev were nivîsandin

Parêzer Xalid Omer destnîşan kir ku danezana destûrî ya niha mîna destûra Baasê bi rengekî navendî ye ku tenê îradeya desthilatdariya heyî temsîl dike. Destûra siberojê divê bi beşdariya hemû pêkhateyan were nivîsandin, mafên neteweyî û çandî were parastin, pergala rêvebirinê jî li ser bingeha demokrasî û nenavendîbûnê were avakirin.**R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1385 | 14-Pûşper-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# PIŞTÎ 8 SALAN JI DAGIRKERIYÊ HÊVIYA VEGERÊ

Di 29'ê Çileyê de peymana ku di navbera fermandarê QSD'ê û serokê hikumeta demkî Ehmed El Şera de hat îmzekirin, yek ji xalên vê peymanê vegera koçberan li heremên xwe bû. Koçberên Serêkaniyê 8 sal in ku ji ber dagirkirina cih û warên wan, li Kampên Serêkaniyê û Waşûkanî jiyan dikin. Piştî vegera koçberên Efrînê, ew jî bi coş û kêfxweşiyeke mezin li benda vegerê ne.**R-4**



## Çawa siyaset dibe amûreke şer, desthilatdarî û berjewendiyan?

Siyaset huner û zanista birêvebirina civakê ye û bi exlaqê civakê ve girêdayî ye. Lê pergala serdest ji bo pêkanîna berjewendiyên desthilatdariyê ew ji cewherê wê qut kirine û xistine xizmeta xwe de...**R-6**




## Qanûna Bicihkirina Mecbûrî ya 1934'an; Planeke nayê jibîrkirin

Qanûna Bicihkirinê ya Mecbûrî qanûneke Komara Tirkiyê ye ku di 14'ê Pûşpera 1934'an de bi hejmara 2510'an hate pejirandin. Armanca bingehîn a vê qanûnê, asîmîlasyona gelên ne-tirk bi taybetî Kurdan û guhertina demografiya Kurdistanê bû.**R-7**


Jina ku xwe diparêze, civakê jî diparêze
Bêrîtan Xalid R-2


Veger Serkeftina Bîr Û Hebûnê Ye
Idrîs Henan R-4


DYA-Îsraîl çima careke din wê êrişê ser Îranê biceribîne?
Pêjder Altan R-6


Çîrok-welat
Remezan Olçen R-9

# Astengdarî nikare rê li pêşiya armanc û xeyalên mirovan bigre

Dema ku israr hebe, çiya dibin deşt û astengî dibin pira serkeftinê. Gulnaz Îbrahîm jî jineke astengdar e ku tevî astengiya xwe, bi hêz û îradeyeke mezin jiyana xwe didomîne. Ew ji bo keça xwe hem dayik e hem jî bav e, tevî hemû zehmetiyên jiyanê kar dike û bi serkeftî bi pêş ve diçe.

**Solîn Mihemed / Qamişlo**

Astengdarî nahêle mirov ji jiyanê qut bibe, berevajî wê dike ku mirov bi awayekî çalak li ber xwe bide û bi zehmetiyan re têbikoşe. Dîrok û serdemên nû tijî astengdar in ku di warên zanist, huner, werzîş û siyasetê de bûne kesên herî pêşeng û navdar. Îradeya xurt xwebaweriyê diafirîne û dihêle ku kesê astengdar jêhatîbûnên xwe yên din bibîne û bi pêş bixe. Dema ku astengdar bi îradeya xwe pêşengiyê dikin, civak jî divê derfetên wekhev ji wan re biafirîne û astengiyên fizîkî û civakî ji holê rake.Pêwîst e em ji bîr nekin ku astengiya herî mezin, "xwegirtin" û "newêrekî" ye; bi vîn û hezkirinê her derî dikare bibe qada serkeftinê.

Astengî ne astengiya bedenî, ya hiş û mejî ye. Gelek kesên astengdar bi vîneke mezin û îradeya hesinî astengiyên li pêşiya xwe derbas kirine û bûne mînakên serkeftinê.



Bingeha jiyaneke serkeftî ne diçêbûyina laş de, lê di hêza xeyal û baweriya hundirîn de ye.

Gulnaz îbrahîm yek ji wan kesan e ku nîşan dide astengdarî nikare rê li pêşiya armanc û xeyalên mirovan bigire.

Gulnaz, ku niha 42 salî ye, di zaroktiya xwe de ji ber nexweşiyekê û lêxistina derziyê lingekî wê pûç bû. Lê ev rewş tu caran nebû sedem ku ew dev ji xwendin û pêşketina xwe berde. Wê xwendina xwe domand heya ku gihîşt zanîngehê û li wir beşa komputer xwend.

Tevî astengiyan jî, Gulnaz her tim dixwest fêr bibe û xwe pêş bixe. Di dema xwendinê de karên cuda jî dikir. Her ku zêdetir bi zehmetiyên kesên astengdar re rû bi rû dibû, wê hewl dida ku mafên wan nas bike û ji bo parastina wan bixebite. Ji ber vê yekê tevlî gelek rêxistinan bû, perwerde dît û fêr bû ka mafên kesên astengdar çi ne.

Gulnaz qet jiyaneke asayî qebûl nedikir. Wê dixwest di civakê de xwedî rol û bandor be. Li her cihê ku diçû, daxwaza mafên xwe û mafên kesên din ên astengdar dikir. Piştre jî li gelek rêxistinan perwerdeyên taybet li ser mafên kesên astengdar da.

Tevî hemû astengiyan, Gulnaz xwe kêm nedidît. Berovajî vê yekê, wê her tim xwe jineke serkeftî û bihêz nîşan dida. Yek ji zehmetiyên mezin ên ku rû bi rûyê wê dibûn, nerînên nebaş ên hin kesên civakê li hember jinên astengdar bûn. Lê wê guh nedida van gotin û nerînan û bi baweriya xwe jiyana xwe didomand.

Sê sal in ku hevjînê Gulnaz ji wê veqetiyaye. Piştî vê yekê, wê biryar da ku ji bo keça xwe hem dayik û hem bav be. Îro ew dixebite da ku hem xwe hem jî keça xwe bi awayekî serbixwe bijîn, nebin girêdayî kesekî din.

Niha Gulnaz di Ofîsa Kesên Astengdar ya Desteya Kar û Barê de kar dike. Tevî ku şert û mercên karê wê carinan dijwar dibin, lê ew hêj bi heman îrade û hêzê kar dike. Ji bo wê, astengî ne tiştek e ku bikare rê li pêşiya armancên wê bigire.

Gulnaz dixwaze wek her jinek û dayikek din, jiyana xwe bi rûmet û serbixwe bidomîne. Ew bawer e ku bi kar, hewl û îrade, mirov dikare li hember her astengiyekê bisekine û serkeftinê bi dest bixe.

# Li Sûriyê Têkoşîna Jinên Kurd

**Jiyan Gencan**

Di nav şert û mercên siyasî yên aloz ên Sûriyê de, jinên Kurd bi rêya têkoşîn û rêxistinbûnê bûn sembola berxwedan û guherînê. Her çareseriya siyasî ya ji bo Sûriyê divê deng, maf û hebûna jinan li navenda xwe bigire. Tenê bi vê awayî dikare aştiyek domdar û civakek demokratîk ava bibe.

Di nav şer û aloziyên siyasî yên ku bi salan li Sûriyê didomin, jin bi taybetî ziyanên giran dîtin. Ji koçberbûnê heta tunebûna ewlehiyê, ji destnedana mafan heta zorê û tundûtûjiyê, jin bûne yek ji herî zêde qurbanên vê krîzê. Gelek jin mal û welatên xwe winda kirin, gelek zarok bê dayik man û gelek malbat jî ji ber şerê domdar belav bûn.

Lê di heman demê de, di nav vê tarîtiyê de jinên Kurd li Bakur û Rojhilatê Sûriyê modela nû ya têkoşîn, rêxistin û azadiyê ava kirin. Bi rêya komîn, meclîs û saziyên jinan, wan nîşan da ku jin dikare ne tenê qurbana şer be, lê her wiha dikare bibe rêvebir, biryardêr û avakerê civakek nû. Rola jinan di siyaset, ewlehî, perwerde û jiyana civakî de bi awayekî berfireh hate xurtkirin.

### Têkoşîna Jinên Kurd û Rola YPJ

Bi taybetî Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) di salên dawî de bûne sembola berxwedanê li hemberî terorê û tundrewiyê. Jinên ku di nav YPJ de cih girtin, ne tenê ji bo parastina ax û welat şer kirin, lê her wiha ji bo parastina nasnameya jinan, mafên civakî û rola jinan di jiyana siyasî de têkoşîn kirin.

Di şerên li dijî DAIŞ û komên tundrew de, jinên YPJ bi berxwedana xwe bal kişandin seranserê cîhanê. Jinên ku li eniyên şer li dijî terorê radiwestiyan, bûn sembola hêvî û azadiyê ji bo gelek jinan li Rojhilata Navîn û dinyayê. Ev têkoşîn, li nav civaka kurd û herêmê de guhertinek mezin afirand û nîşan da ku jin dikare di hemû qadên jiyanê de pêşeng be.

Di heman demê de, YPJ tenê wekî hêzek leşkerî nehate dîtin. Ew bûye sembola şoreşa jinan û nêrînek nû ya civakî ku bingeha wê li ser wekhevî, azadî û beşdarbûna jinan hatiye avakirin. Ji ber vê yekê gelek jinên ciwan YPJ wekî rêya parastina hebûn û nasnameya xwe dibînin.

### Entegrasyona YPJ û Civîna bi Wezareta Parastinê Re

Di şert û mercên siyasî yên niha de, mijara entegrasyona YPJ û hêzên herêmî di nav avahiyên fermî yên ewlehiyê de bûye yek ji mijarên herî girîng. Di vê çarçoveyê de civîna ku di navbera Fermandarên YPJ û Wezareta Parastinê de hat lidarxistin, girîngiyek taybet heye. Ev civîn ne tenê ji bo nîqaşa mijarên leşkerî bû, lê her wiha wekî gavek ji bo diyalog û rêxistinkirina pêşeroja herêmê hate dîtin. Di civînê de hate gotin ku pêdivî ye ku ewlehî bi awayekî hevpar were rêvebirin û di heman demê de taybetmendiyên hêzên jinan jî bên parastin.

### Rewşa Herêmê û Pêdiviya Parastina Mafên Jinan

Rewşa herêmê hîn jî gelek aloz e. Tirsên ewlehiyê, hewildanên derve û nakokiyên navxweyî bandorê li ser jiyana rojane ya gelan dikin. Di şertên wiha de, parastina destkeftiyên jinan dibe pêdiviyek bingehîn.

Jinên ku bi berdelên giran û berxwedanê gelek destkeftî bi dest xistine, niha dixwazin ku di her çareseriya siyasî de deng û rola wan were parastin. Gelek jin dibêjin ku bê beşdarbûna rastîn a jinan nikare aştiyek domdar ava bibe. Ji ber ku jinên herêmê di salên şer de rolek girîng lîstin, naha jî dixwazin di avakirina pêşerojê de cihê wan hebe.

Her wiha, gelek rêxistinên mafên mirovan bang dikin ku divê mafên jinan di her qanûn û rêkeftinên siyasî de bêne parastin. Ew hîşyar dikin ku her paşveçûn di mafên jinan de dikare bandoreke neyînî li ser tevahiya civakê bike.

Pêşeroja Sûriyê bêyî beşdarbûna rastîn a jinan nikare aram û dadperwer be. Têkoşîna jinên Kurd nîşan da ku jin ne tenê qurbana şer e, lê dikare bibe avakerê aştiyê û demokrasiyê jî.

Di şert û mercên ku herêm di qonaxeke nû de ye, entegrasyona YPJ û civînên ku bi Wezareta Parastinê re tên lidarxistin dikarin bibin gavên girîng ji bo avakirina pêşerojek nû.

Ji ber vê yekê, her çareseriya siyasî ya ji bo Sûriyê divê deng, maf û hebûna jinan li navenda xwe bigire. Tenê bi vê awayî dikare aştiyek domdar û civakek demokratîk ava bibe.

**Ji Ramanên Jin**



## Jina ku xwe diparêze, civakê jî diparêze

Jina Kurd di dîrokê de ne tenê wek dayik an jî mamosteyê civakê hatiye nasîn, lê her dem di demên zehmet de rolek parastinê jî girtiye. Ji berxwedanên dîrokî heta sîstemên nûjen ên xweparastinê, jina Kurd bûye sembola hêz, azadî û parastina civakê.

Hêza Parastina Jin, ango YPJ'ê ji sala 2013'an ve bûye yek ji sembolên girîng ên têkoşîna jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê. YPJ'ê ne tenê hêzeke leşkerî ye, lê her wiha temsîla îradeya jinan, azadî û beşdarbûna wan di hemû warên jiyanê de dike. Di salên şerê li dijî DAIŞ'ê de, şervanên YPJ'ê roleke girîng lîstin û navê wan li ser asta cîhanê hate nasîn. Îro, bi guherînên siyasî û leşkerî yên li Sûriyê, mijara entegrasyona hêzên leşkerî bûye yek ji mijarên ku gelek tê gotûbêjkirin. Di vê çarçoveyê de, gelek aliyên civakê dibêjin ku YPJ'ê ne tenê hêzeke leşkerî ye, lê her wiha destkeftiyeke girîng a jinan e ku di salan de bi fedakarî hatî ava kirin. Ji ber vê yekê, gelek jin û rêxistinên jinan balê dikişînin ser parastina hebûna YPJ'ê û rola wê di pêşerojê de.

Piştgiriya ku ji bo YPJ'ê tê nîşandan jî tenê ji aliyê şervanan ve nayê. Li gelek deveran, rêxistinên jinan, çalakvanên civakî û kesayetiyên siyasî dibêjin ku hebûna YPJ'ê garantiya beşdarbûna jinan di warê ewlehiyê û biryargirtinê de ye. Li gorî wan, her çareseriyek ku ji bo pêşeroja Sûriyê tê lêgerîn, divê cihê jinan û destkeftiyên wan jî di nav de were parastin.

Di heman demê de, gelek kes bawer dikin ku têkoşîna YPJ'ê di salên borî de derfeteke mezin çêkir ku jin di gelek waran de xwe bidin nîşandan û rola xwe ya çalak li civakê zêde bikin. Ji ber vê yekê, nîqaşên niha yên derbarê entegrasyonê de ne tenê nîqaşên leşkerî ne, lê her wiha bi maf, temsîl û destkeftiyên jinan ve girêdayî ne.Di encamê de, YPJ îro ji bo gelek jinan sembola berxwedan, azadî û xwebirêvebirinê ye. Her çiqas rewşa siyasî û leşkerî diguhere jî, gelek aliyan dibêjin ku divê rola jinan û destkeftiyên ku di salên borî de hatine bidestxistin bên parastin û di pêşerojê de jî bên xurtkirin. Ev jî dibe sedem ku nav û rola YPJ'ê hîn jî di nava gotûbêjên girîng ên li ser pêşeroja Sûriyê de cihê xwe biparêze.Hebûna YPJ'ê îspat kir ku jin dikarin rola herî çalak di jiyana civakî û siyasî de bilîzin, bi vî awayî rola jinê ji çarçoveya kevneşopî derxist û ew kir biryarder di civakê de.Rola YPJ'ê di têkoşînê de ew veguherandiye çavkaniyek mezin a îlhama ji bo tevahî jinên cîhanê û jinên Rojhilata Navîn bi giştî.

Dîroka jina kurd dîroka tenê berxwedanê nîne, dîroka parastina nasname, ziman û civakê ye, ji ber vê îro jin di her cihekî de xwedî rol û misyone , vê hişt ku ji tevahî cîhanê re bibe nimûne û her kes ji vê tecrûbeyê fêde bigre .



# 5 daristanên baranê yên herî mezin di cîhanê de

Daristanên baranê yên tropical (Medarî) roleke girîng di pergala avhewayê ya gerdûnî de dilîzin; ji bo çemên mezin avê dabîn dike, herwiha germahiya gerdûnê, baran û şêwazên hewayê rêxistin dike.

**Navenda Nûçeyan**


Daristanên baranê yên tropîkal di nav ekosîstemên erdê de roleke girîng dilîzin, avê ji bo çemên herî mezin ên cîhanê dabîn dikin. Di heman demê de gelek karbonê vedhewîne, germahiyê bi rêkûpêk dike, bandorê li baran û şêwazên hewayê hem li ser asta herêmê û hem jî li cîhanê dikin; bi kurtasî, ew damara pergala avhewayê ya gerdûnî ne.

Tevî girîngiya wê ya mezin, ji salên 80'ê ve rêjeya birîna daristanên tropîkal di cîhanê de bi berdewamî di asteke bilind de maye, ev yek bi sedema daxwaza mirovî ya xwarin û sotemeniyê, herwiha berfirehbûna bajaran û çavbirçîtiya şîrketan, di heman demê de ne naskirina nirxa daristanan wekî ekosîstemên saxlem ên bi pêdivî. Ji sala 2022'an ve, salane nêzî 3,2 milyon hektar daristanên tropîkal têne birîn, ku cureyên daristanên yê herî biyolojîk-cûrbecûr û karbon-zêde ye, tê wêrankirin.

Ev rapor balê dikşîne li ser 5 daristanên baranê yên herî mezin di cîhanê de, li gorî ku di platforma (Mongabay) ya têkildarî zanist û parastina jîngehê de hatiye.

### Daristana Amazon

Amazon daristana tropîkal a herî mezin û navdar di cîhanê de ye. Ji hêla rûbera daristanên pêşîn ve, ew sê qat ji Hawza Kongoyê, ku duyemîn daristana tropîkal a herî mezin di cîhanê de ye, mezintir e. Çemê Amazonê, çemê herî mezin di cîhanê de ye 5 qat ji ava Çemê Kongoyê an jî 12 qat ji ava Çemê Mississippi zêdetir avê wê hildigire. Daristana Amazonê di warê windabûna salan e ya rûbera daristanên tropîkal de jî di rêza yekem de ye. Di navbera salên 2002 û 2019'an de, zêdetirî 30 milyon hektar daristanên sereke li herêmê hatin qutkirin, ku nêzîkî nîvê windabûna giştî ya daristanên sereke yên tropîkal ên cîhanê, di wê demê de.



Nêzî ji sedî 60 daristanên baranê yên Amazonê di nav sînorên Brezîlyayê û ji sedî 13 jî li Perûyê de ye, yên mayî jî di navbera Kolombiya, Venezuela, Bolîvya, Guyana, Ekvador, Sûrînam û Guyanaya Fransî de belav bûne.

Li daristana baranê ya Amazonê ji 40 hezar cureyên şînatiyan zêdetir heye, di nav wan de 16 hezar dar, 3 hezar cureyên masiyan, hezar û 300 cureyên çûkan, hezar cureyên amfîbîyan, 430 cureyên meymûnan û 400 cureyên xijende hene.

Tevî girîngiya wê, li piraniya welatên hawza Amazonê, bi taybetî li Brezîlyayê, birîna daristanan zêde dibe. Amazon di sala 2001'an de zêdetirî 30 milyon hektar daristên pêşîn ji sedî 5,5 rûbera xwe winda kir û di navbera salên 2002 û 2019'an de 44,5 milyon hektar ji rûpoşa daran bi rêjeya ji sedî 6,6 winda kir.

### Daristanên Kongoyê

Duyemîn mezintirîn girseya daristanên baranê yên tropîkal li Hewza Kongoyê ye, bi rûberek 3,7 mîlyon kîlometre çargoşeyî digire nav xwe. Piraniya daristanên baranê yên Hewza Kongoyê ji sedî 60 di Komara Demokratîk a Kongoyê de ye. Mayîna daristanên baranê yên Hewza Kongoyê li Gabon, Komara Kongoyê, Kamerûn, Komara Afrîkaya Navîn û Gîneya tropîkal ye.

Daristanên baranê yên Kongoyê bi rûbereke 288 milyon hektar rûpoşa daran vedihewînin, di nav de 168 milyon hektar daristana xwezayî yên kevin (heta sala 2020'an). Ji sedî 60 ji daristanan li Komara Demokratîk a Kongoyê, ji sedî 13 li Gabonê, ji sedî 12 li Komara Kongoyê, ji sedî 10 li Kamerûnê, ji sedî 3 li Komara Afrîkaya Navîn û ji sedî 1 li Gîneya tropîkal ne.

Birîna daristanên baranê yên Kongoyê bi lez zêde dibe, her çend bi rêjeyek kêmtir ji deverên din ên daristanên mezin, zêdetirî 6 mîlyon hektar daristanên sereke ji sedî



3,5 ji qada wê ya sala 2001'an û 13,5 mîlyon hektar rûpoşa daran ji sedî 4,5 di navbera salên 2002 û 2019'an de winda bûye.

### Daristanên Awistralyayê

Daristanên baranê yên Awistralyayê daristanên tropîkal ên li Gîneya Nû û bakur-rojhilatê Awistralyayê, herwiha giravên belavbûyî yên ku dema asta deryayê di Serdema Qeşayê ya dawî de daketiye ve girêdayî ne, dihewîne.

Di encama vê girêdanê, her du kitleyên bejahî komên nebat û lawiran parve dikin. Hemû daristanên tropîkal ên sereke li vê herêmê li girava Gîneya Nû ne, ku navbera Endonezya û Papua Gîneya Nû de parvekirî ye.

Daristana baranê ya Awistralyayê 89 milyon hektar rûpoşa daran vedihewîne, di nav de 64 milyon hektar daristanên serekedi sala 2020'an de. Ew li seranserê parêzgehên Endonezyayê yên Papua û Papua Rojava belav bûye, ku ji sedî 51 daristanên sereke yên herêmê pêk tîne, ji sedî 49 Papua Gîneya Nû û ji sedî 1 Awistralyayê pêk tîne.

Ji ber berfirehbûna çandiniyê, bi taybetî jî ji ber çandina zeviyên zeytê, birîna daristanan li vê herêmê bi lez zêde dibe. Beşa Endonezyayî ya Gîneya Nû ji sala 2002'an vir ve 605 hezar hektar daristanên pêşîn winda kiriye, ku ev yek ji sedî 1,8 rûbera xwe ya sala 2001'an temsîl dike. Di heman demê de Papua Gîneya Nû 732 hezar hektar, an jî ji sedî 2,2 rûbera xwe winda kiriye. Gîneya Nû wekî sînorê dawîn ê berfirehbûna çandiniya pîşesazî ya mezin li Endonezyayê tê hesibandin.

### Daristanên Sandallandê

Daristanên Sandalandê giravên Borneo, Sumatra û Java herwiha Nîvgirava Malezya dihewîne. Piraniya daristanên mayî yên herêmê li girava Borneo ne, ku ji hêla siyasî ve di navbera Endonezya, Malezya û Bruneiyê de dabeş bûye.

Li gorî daneyên herî dawî yên sala 2020'an, daristanên baranê yên Sandalandê 103 milyon hektar rûpûşa daran vedihewînin, di nav de 51 milyon hektar daristanên sereke hene. Endonezya ji sedî 73'ê daristanên herêmê pêk tîne, piştî wê Malezya ji sedî 26, di heman demê de Brunei û Singapûr jî ji sedî 1 kêmtir xewdî daristanên li herêmê ne.

Sandaland di navbera salên 2002 û 2019'an de pareke mezin ya daristanan di cîhanê de winda kir, tenê li Borneo 5,8 milyon hektar daristanên sereke winda bûn (li gorî sala 2001'an ji sedî 15), li Sumatrayê 3,8 milyon hektar (li gorî sala 2001'an) winda bûn, li Nîvgirava Malezyayê jî 726 hezar hektar bi rêjeya ji sedî 14 winda bûn. Endonezyayê ji sedî 75 windabûna tevahî daristanên sereke yên herêmê pêk anî, li gorî ji sedî 25 bo Malezyayê.

### Daristanên Bormiyê yên Hindistanê

Herêma Hind-Bormiyê tevlîheviyek cihêreng ji cureyên daristanên tropîkal dihewîne, ji darên mangrov û daristanên baranê yên nizm bigire heya daristanên demsalî. Di dîrokê de, windabûna berfireh a daristanan ji ber zexta nifûsa mirovan, tê vê wateyê ku daristanên mayî yên li vê herêmê ji deverên din ên ku berê hatine behs kirin bêtir perçe perçe ne. Piraniya rûpoşa daran a herêmê ji zeviyên çandinî, berhemên çandiniyê û daristanên duyemîn pêk tê.

Ev daristan li seranserê çend welatan dirêj dibin, bi taybetî Myanmar, ku ji sedî 34 rûbera daristanên sereke ya herêmê pêk tîne, piştre Laos bi sedî 19, Viyetnam bi sedî 15, Tayland bi sedî 14 û piştre re Kamboçya, Rojhilata Dûr a Hindistanê û hin beşên başûrê Çînê bi rêjeyên cûda.

Bi tevahî, li gorî daneyên herî dawî yên sala 2020'an, daristanên baranê yên cîhanê li Hindistan û Myanmarê qadeke ku 139 milyon hektarî ji daran pêk tê, ku 40 milyon hektar ji wan daristanên sereke ne.

Di derbarê birîna daristanan de, Kamboçyayê ji sedê 34 daristana xwe ya sereke winda kiriye, piştre Laos ji 21, Viyetnam ji 18 û Myanmar ji 16, tên. Kamboçyayê ji sala 2001'an û vir ve ji sedî 28 daristana xwe ya sereke winda kiriye, bi zêdebûna veguherîna daristanên xwezayî bo zeviyên çandiniyê û projeyên pîşesaziyê.

Di heman demê de daristanên din ên cîhanê jî hene, ku ji aliyê rûberê ve piçûktir in lê ji aliyê biyolojîk cihêreng û çavkaniyan ve dewlemend in, wek daristanên Amerîkaya Navîn, daristanên Gîneyê yên Afrîkaya Rojava, Daristana Atlantîkê ku ji bakur-rojhilatê Brezîlyayê heta hundirê Arjantîn û Paraguayê dirêj dibe, Daristana Chocó Darín ku ji başûrê Panamayê heta perava Pasîfîkê ya Amerîkaya Başûr dirêj dibe û daristanên din, bi taybetî li Asyayê.

# Di nav Eşîrên Kurdan de; Rola jina Kurd

Esma Mistefa

Jinên Kurd ji demên kevnar ve di eşîrên mezin ên Kurd de roleke girîng lîstine. Hebûna wan ne tenê bi karên navmalî ve sînordar bû, lê di hin serdemên dîrokî de heta warên serokatiya civakî, parastina yekîtîya eşîrê, û beşdarbûna di jiyana aborî û heta jiyana siyasî û leşkerî de jî berfireh bû. Li gorî hin civakên din ên kevneşopî, civaka Kurdî ji bo jin qadek û ciheke firehtir di beşdarbûn û bandora wê di nav avahiya eşîrî de, hatiye veqetandin.

Di nav eşîrên kevnar ên Kurd de, jin wekî sembola rumet û kerameta eşîrî dihatin hesibandin, û wan roleke bingehîn di veguhestina adet, kevneşopî û nirxan de ji nifşekî bo nifşekî din dilîstin. Dayik û dapîran jî di mezinkirina zarokan de li ser rastiya wêrekî, aîdiyet û comerdîyê, mezin kirin. Ev taybetmendiyên dîrokî ne ku bi civaka Kurd û eşîrî ve girêdayî ne.

Ji aliyê aborî ve, jinên Kurd beşdarî gelek çalakiyên rojane bûn, bi taybetî li gund û herêmên çiyayî. Wê di warên çandinî, lênêrîna ajalan, hilberîna şîr û çêkirina xalîçe û cilên gelêrî de dixebitî ku ev yek wê kir berhemdar û beşdarek di aramiya aborî ya malbat û eşîrê de. Gelek caran, jinan di dema nebûna mêran de ji ber şer an pevçûnên eşîrî berpirsiyariyên girîng hilgirtin ser xwe.

Ji aliyê civakî ve, hin jin di nav eşîr û qebîleyên sereke de xwedî pozîsyonek bi bandor bûn, li wir ew destwerdan di çareserkirina nakokî û sererastkirina têkiliyên di navbera qebîleyan de dikirin, û ji şehrezayî, ezmûn û rewşa malbatê sûd werdigirtin. Hin jin bi kesayetiyên xwe yên bihêz û şiyana xwe ya bandorkirina li ser biryarên mêr û serokên eşîran dihatin nasîn, bi taybet heke ew ji malbatên pêşeng bin an jî jinên şêxên eşîran bin.

Di dîroka Kurdan de, jinên navdar derketine holê ku rolên serokatiyê û leşkerî lîstine, bi taybetî Xanzad ku bi aqilmendiya xwe ya siyasî dihat nasîn, û her weha Kara Fatime ku di serdema Osmaniyan de rêberiya şervanên Kurd dikir. Ne tenê ew gelek jinên din jî di demên şer û pevçûnan de di parastina herêm û eşîrên xwe de derketin pêş.

Tevî xwezaya eşîrî ya muhafezekar a hin herêman, jinên Kurd di bûyerên civakî, stran û folklora wan de hebûneke berbiçav parastine. Stranên kevneşopî yên Kurdî pir caran jinan wekî xurt, sebirkar û fedakar nîşan didin. Navên wan her wiha bi parastina nasname, ziman û mîrata çandî ya Kurdî ve girêdayî ne.

Bi derbasbûna demê re, bandora jinên Kurd di nav civaka eşîrî de berdewam kir, lê bi awayên cûda, ji ber ku ew di perwerde, siyaset, medyayê û xebata sivîl de bêtir xuya bûn, di heman demê de rehên xwe yên civakî û eşîrî parastin. Îro, jinên Kurd di bîra nûjen a Kurdan de sembola têkoşîn û berxwedanê ne, ji ber rola wan a dîrokî û civakî ku di seranserê sedsalan de dirêj bûye.

### Dîroka Eşîrên Kurdan

Eşîrên Kurdan xwedî dîrokeke kûr in ku digihîje serdemên kevnar, di nav de serdema Medan (sedsala 7an berî zayînê). Hin lêkolîner bawer dikin ku navên eşîrên Kurdan ji zimanê Hûrîyan (Hurrian) hatiye, wekî ku Mikhail Semenovich Lazarev di lêkolînên xwe de destnîşan kiriye. Di çavkaniyên Îslamî yên sedsala 14'an de, wekî pirtûka Şîhabedîn Omerî ya bi navê Masalik al-Absar, lîsteyeke eşîrên Kurdan hatiye qeydkirin. Di vê lîsteyê de eşîrên wekî Gûranî, Gilalî, Kusa û Mabir bi cihwar û gelheya wan ve têne behskirin.

Di serdema Împaratoriya Osmanî û Safevî de, eşîrên Kurdan bi gelemperî xwedî otonomiyeke nîv-serbixwe bûn. Mînak, di sala 1514'an de, di dema Şerê Çaldiranê de, eşîrên Sunnî yên Kurdan xwedî xweseriyeke girîng bûn û bi hikûmeta Osmanî re têkilî danîbûn. Şeref Xan, di pirtûka xwe ya navdar Şerefname de (1597), behsa gelek eşîrên Kurdan dike, wekî eşîra Roşkî, ku li Bedlîsê û derdora wê hikûmetên xweser ava kiribûn.

Piştî Peymana Qesra Şîrîn (1639), Kurdistan di navbera Osmanî û Safeviyan de hate parçekirin, ku ev yek bandoreke mezin li ser eşîrên Kurdan kir. Eşîrên wekî Barzanî, Berzencî û Rewandûzî di sedsalên 19an û 20an de bi serhildanên xwe yên li dijî desthilatên navendî navdar bûn.

### Rola Eşîretan di Têkoşîna Neteweyî ya Kurdan de

Eşîrên Kurdan di dîrokê de di gelek serhildanên neteweyî de cih girtine. Mînak:

Serhildana Şêx Mehmûdê Berzencî (1919): Eşîra Berzencî bi 300 şervanên eşîrî li dijî Brîtanyayê serî hilda û hewl da ku Kurdistana xweser ava bike.

Serhildana Şêx Seîdê Pîran (1925): Eşîrên Kurmancî û Zaza li Bakurê Kurdistanê bi serokatiya Şêx Seîd li dijî Komara Tirkiyê serî hildan.

Têkoşîna Barzaniyan: Eşîra Barzanî di sedsala 20'an de di bin serokatiya Mele Mistefa Barzanî de li dijî rejîma Îraqê têkoşiya û di damezrandina Herêma Kurdistanê de roleke sereke lîst.



Ji navdartirîn û mezintirên eşîrên Kurdan ev in; Eşîra Barzanî, Eşîra Berzencî, Eşîra Caf, Eşîra Kurdikî (Girdî), Eşîra Roşkî, Eşîra Şêxbizeynî, Eşîra Gûranî.

### Jinên Kurd

Qedem Xêr- Jinek e dilawer, xweşik û têgihiştî bû. Di şerên qebîleyan de ji zilamên qebîleya xwe re pêşeng û piştevanî dikir. Dem bi dem, dema ku qebîleya wan rastê êrîş û dorpêça dijmin dihat, ew Qedem Xêr bû ku bê tirs di nav agir û dengê tifingên dijmin de ji bo rizgar kirina qebîleya xwe erzaq û alavên leşkerî digihand û gelek caran jî ev tevgera wê a wêrek dibû sedem ku herkes jê hêz bigire.

Di sala 1307-1308´an de (li gor dîroka Xurşîdî) hêzên artêşa Riza Xan êrîşê eşîrên pişt çiyayan yên Loristanî dike, lê eşîra qelawend weke eşîrên din yên li herêmê rê nadin ketina hêzên dewletê û êrîşên wan têk dibin. Û ev têkoşîn, wê navê Qedem Xêra Loristanî ku wek fermande û rêbera hêzên cengawerên Lor ku nêzî pênc salan li dijî dagirkeran têkoşiyan, bê bibîranîn û bikeve nav rûpelên dîrokê.

Adîle Xan- Ew jina navdar sala 1895'an li gel kesekî naskirî yê devera Helebcê yê bi navê "Osman" dizewice. Piştî mirina Mehmûd Paşayê Caf serokayetiya eşîra Cafan dikeve stûyê Osman Paşayê Caf û Adîle Xanim jî dibe hevkarê mêrê xwe.

Dema ku Osman Paşa sala 1905'an diçe ser dilovaniya xwe û koça dawî dike, Adîle Xan hemû karûbarê eşîra Caf birêve dibe û nav û bangê wê li hemû deverê Şarezor û Hewreman û cihên din ên Başûrê Kurdistanê belav dibe û herwisa rêzeke zêde jî di nav xelkê Rojhilatê Kurdistanê de li hember wê tê nîşandan.

Birêvebirina karûbarê eşîreteke mezin li devera Helebçe û deşta Şarezor û afirandina pêwendiyên bihêz li gel Îngilîziyan karê herkesê nebû, lê wê jina Kurd a zîrek ew erk da ser milê xwe. Piştî serkirdayetîkirina eşîreteke mezin a wekî eşîreta Caf, desthilata wê ewqas mezin bû ku bi Şajina bê Tac a Şarezorê hatibû nasîn.

Her wek tê zanîn, Adîle Xanim yekemîn Qaymeqama jin di dîroka Iraqê de bûye û di sala 1909'an ew bûye Qaymeqama Helebceyê. Wê jina navdar bi anîna şaristaniyeke modern di nav xelkê xwe de û bi kar û xizmetên ku bo netewa xwe kir, bo mînakek bo hemû jinên li dû xwe û da xuya ku jin jî dikare bandorek mezin li ser civata xwe ava bike û dikare di gelek waran de bo pêşxistina netewa xwe xizmetê bike.

# Afrînera jiyanê; Jin

Amara Baran

Di dîroka mirovahiyê de "jin û jiyan" du têgehên ku ji hev nayên veqetandin in. Jin çavkaniya jiyanê ye, afirîner û koka bingehîn a civakê ye. Dema ku jin azad be û mafên wê bên parastin wê civak jî azad be, Peyva "jiyan" tenê nayê maneya hebûna fizîkî. Jiyan hezkirin, hêvî, pêkanîn, afirandin e. "Jin" jî ê ku di hemû waran de diafrîne û rêve dibe, û xwedan role. Bi hezkirin jiyanê hembêz dike û diafrîne, bi fikra xwe çareseriyan dibîne û bi hêza xwe li dijî tevahiya astengiyan radiweste. Ji ber vê yekê gelek milan de jin wekî sembola jiyanê tê dîtin. Di civaka nûjen de, gotin û axaftinên ku di qada giştî de têne kirin, roleke mezin di avakirina nêrînên civakî de dileyzin. Dema ku ev gotin li ser komên etnîkî an jî jinan têne gotin, dikarin bibe sedema nerazîbûnan. Jinên Kurd, ji ber parastina nasnameya xwe ya etnîkî rastê gelek erîşên nijadperest tê.

Di van salên dawiyê de li ser medya Dîjîtal gelek êrişên ne ji rêzê ji bo jinên kurd têne kirin mesele ne tenê jina kurd e, mesele nasnameya jinbûyinê ye, û tunekirina îradeya jin e. Yek ji van mînakan jî Rahmî Koç e. Di dema vekirina Nexwaşxaneyek li îzmîrê de di bin nave ku "fiqrayan" dibêje bi gotinên xwe hekeret li jina kurd dike, mixabin kesên li kêleka wî jî, bê ku bertek nîşan bidin dikeniyan. Ev jî dide ispatkirin, hebûn û nasnameya jina kurd keleme li pêşiya wan. Her çiqas ji aliyê tevgerên jinan ve bû cihê nerezîbûn û bertekan jî lê pir zêde têrker nebû. Ev bertek tenê di çarçoveya bertekên tevgera û rêxistinên jinan de sînordar ma. Belê me li li jor jî balkişand ser girîngiya "jin û jiyan"ê. Du peyvên ku jihev nayên veqetandin, mixabin di roja me ya îro de ev ji aliyê pergala desthilatdar ya malbatê de vegeriya parastina "Namûsê" gelek jin bûn qurbana gotina "NAMÛS" di bin nave ku ez şerefa xwe paqij bikim. gelek jin ji aliya bav, ap, bira, hezkirî û hevjînê xwe ve tên kuştin.

Roj nîne ku em di malpar û di tv yan de nûçeyên kuştin, tecawûz, revandinên jinan nebîhîsin. Lê mixabin bûyerên bivî rengê di nav civaka me de pir ji rêzê tê dîtin. Êdi jin li ber rehma kastîk katîl ê demê re hatiye hiştin. Jin dibin hedefa zîhniyeta qastik katilên roja me ya a ku îro ji aliyê desthilatdaran ve tê meşandin. Armanca vê siyasetê bi awayek sîstematîk îradeya jina ku bûye sembola afirandina jiyanê dike hedef. Pergala desthilatdar ji bo parastina zihniyeta kujer di bin nave namûsê de bi hezaran jin dike qurban. Ger ku civak dixwaze parastina nirxên xwe bike lazime beriya hertiştê afîrenera jiyanê biparêze.

di encam de em dikarin bêjin ku Jiyana jinan mafek bingehîn e ku divê were parastin. Civakek ku nikare jinê biparêze, nikare xwe wekî civakek dadperwer û pêşketî binirxîne. bertek nîşandayîn ne tenê karê jinane erka tevahiya civak û mirovahiyê ye.



# Rûsya hebûna xwe ya leşkerî li Sûriyê ji nû ve rêxistin dike

**Piştî derbasûbna zêdeyî sal û nîvekê ji hilweşîna rêjîma Eseed, Rûsya hebûna xwe ya leşkerî li Sûriyê parastiye û ji nû ve rêxistin dike. Herwiha hewl dide ku bi hikumeta demkî ya Sûriyê re têkiliyên aborî û leşkerî pêş bixe.**

Navenda Nûçeyan

Piştî rûxandina rêjîma Essed ku hevalbendê wê yê yekem Rûsya bû, di hemû aliyan de gelek guhertin li ser xaka Sûriyê çêbûn. Lê tevî van guhertinan jî Rûsya dikarîbû hebûna xwe ya leşkerî di nava du baregehên leşkerî yên mezin li Berava Sûriyê biparêze.

Li gorî 'The Wall Street Journal', Rûsya beriya demeke ne dirêj, keştiya barhilgir a bi nave 'Sparta' şand da ku amûrên leşkerî û lojistîk ji baregehên xwe yên leşkerî li Sûriyê dabîn bike. Keştî di meha Adarê de ji bendera Petersburgê derket û di meha Gulanê de gihîşt bendera Tartusê ya Sûriyê. Ji dema rûxandina rêjîma Essed, ev yekem mîsyona dabînkirinê ya bi vî rengî ye .

Wêneyên satelîtê yên ku ji hêla pargîdaniyek wêneyên satelîtê ya bazirganî ve hatine kişandin, nîşan didin ku Sparta berî ku rêwîtiya xwe ya ber bi Deryaya spî a Naverast ve bike, li bendra Petersburgê hatiye barkirin. Wêneyên din ên ku ji hêla Planet Labs ve hatine weşandin nîşan didin ku ew di 11ê Gulanê de li bendera Tartusê rawestiyaye.

Hin berpirsên Amerîkî, di axaftina xwe de ji Wall Street Journal re, destnîşan kirin ku Sparta, ku xwediyê wê ji ber veguhestina çekan ji bo Wezareta Parastinê ya Rûsyayê di bin cezayên Amerîkî de ye, alavên ku ji bo baregeha hewayî ya Hmeymîm a Rûsyayê hatine şandin, hildigirtbû.

Vê pêşketinê hin berpirsên di rêveberiya Amerîkî de aciz kiriye ku hêvî dikirin ku têkçûna rêjîma Esed dê derbeyek stratejîk li Rûsyayê bide bi mehrûmkirina wê ji platformek sereke ji bo kontrola wê li Afrîka û Amerîkaya Başûr.

Di destpêka vê salê de jî, artêşa Amerîkî hebûna xwe ya zêdetirî deh salan li Sûrî bi dawî kir, ji baregehên ku beşek ji mîsyona şerê li dijî DAIŞê bûn, vekişiya.

Baregeha hewayî ya Hmeymîm û baregeha deryayî ya li Tartusê du stûnên sereke yên projeksiyona leşkerî ya cîhanî ya Rûsyayê ne. Moskowyê ew wekî baregehên destpêkirinê ji bo operasyonên leşkerî yên dûrî sînorên xwe û herweha deriyê leşkerî yê ber bi Deryaya Spî ve bi kar anîne. Ji ber vê sedemê, parastina wan piştî hilweşîna Esed bû pêşîniyek yekser. Lê ev kar ji bo Moskow ne hêsan bû, ku deh sal berê baregeha Hmeymîm bikar anî da ku operasyoneke bombebaranê bide destpêkirin ku di şerê navxweyî yê Sûriyê de piştgirî da rejîma Esed û bû sedema mirina bi hezaran kesan.

Piştî hilweşîna rejîmê, Rûsyayê hêzên xwe yên deryayî ji Tartusê vekişand û hebûna leşkerên xwe li Sûriyeyê kêm kir. Lêbelê, serokê demkî yê Sûriyeyê, Ehmed el-Şaraa, ku berê li dijî Esed û Rûsan şer kiribû, bi Moskowê re li ser pêşeroja baregehên leşkerî yên Rûsyayê danûstandinan domand. Ji dema ku dest bi desthilatdariyê kiriye, wî hewl daye ku têkiliyên hevseng bi hem Rûsya û hem jî welatên Rojavayî re pêş bixe, serdana Washington û Moskowê dike da ku ji bo hikûmeta xwe nasnameyek navneteweyî bi dest bixe.

Sparta di bin cezayên Xezîneya Dewletên Yekbûyî de ye, her weha xwediyê wê, SC South, û pargîdaniya wê ya dêûbav, Oboron Logistics, ku dibêje çalakiya wê ya sereke peydakirina karûbarên lojîstîkî ji Wezareta Parastinê ya Rûsyayê re ye.

Sparta beşek ji fîloyek piçûk a keştiyên barhilgir e ku Rûsyayê ji bo veguhestina bi dizî ya çek û



alavên leşkerî li herêmê bi rêya toreke pargîdaniyên girêdayî hikûmeta Rûsyayê bikar aniye. Ev keştî her wiha ji bo derbaskirina qedexeyên ku niha rê li ber Rûsyayê digirin ku keştîyên wê yên şer ji Deryaya Reş derbas bibin hatine bikar anîn.

York Isik, rêveberê şêwirmendiya Bosphorus Observer, ku pisporê şopandina trafîka deryayî ye, ji The Wall Street Journal re got: "Sparta û hemî keştîyên xwişk ên wê xwedî dîrokeke dirêj a hevkariyê bi hikûmeta Rûsyayê re ne. Me bi zelalî dît ku ew alavên leşkerî li Tartusê dadixin."

Digel vê yekê, hin rayedarên Amerîkî hîs kirin ku ev mîsyon fikarên taybetî dernexistiye holê, ji ber têkiliya başnaskirî ya di navbera Şam û Moskowê de, û ji ber ku alavên leşkerî yên Rûsyayê ji deverên berjewendiya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dûr bûn, ku bi giranî li bakurê rojhilatê Sûriyê ne.

Hêjayî gotinê ye ku Serokê berê yê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Joe Biden rakirina cezayên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li ser Sûriyeyê piştî hilweşîna Esed bi rakirina baregehên Rûsyayê ji welêt ve girêdabû, lê rêveberiya Trump paşê ev şert terikand û biryar da ku bêyî şert û merc cezayên li ser Sûriyeyê rake.

# Guhertina demokratîk tekane çareserî ye ji bo bidawîkirina kirîzê

Cemîl Xoce

Civaka li Tirkiyê di van rojan de kirîzeke siyasî ya pir mezin dijî. Ev krîz rasterast bi pirsgirêka Kurd a ku ji salên dirêj ve berdewam dike ve girêdayî ye. Nebûna çareseriyên rastîn, rê li ber pêşveçûna Tirkiyeyê bi temamî digire. Desthilatdariya heyî ji bo pêkanîna aştiyê tu gavên cidî navêje. Ev paşveçûn dibe sedem ku rewşa siyasî û aborî roj bi roj xirabtir bibe. Aştî hewcedarî wêrekiyê û biryarên zelal ên hemû aliyan e. Bêyî van biryaran wê êş û azar berdewam bikin. Her wiha wê pêşveçûn di herêmê de pir dereng bikeve.

### Nebûna demokrasiyê rê li ber aştiyê digire

Dewleta Tirkiye di nêzîkatiya xwe ya li hemberî pirsgirêka Kurd de tenê pişta xwe dide hêza ewlehiyê. Polîtîkaya tecrîdê ya li dijî Rêber Ocalan, rê li ber hewlên wî digire û nikare bi rengekî azad û eşkere bixebite. Ev tecrîd di qonaxa heyî de wekî astengiyeke bingehîn li pêşiya her geşedaneke erênî radiweste. Ji bo ku pêvajoya aştiyê bi ser bikeve, divê derfeteke tam ji bo Rêber Ocalan were dayîn, ji ber ku ew tenê sermizakervan û lêvegerê vê pêvajoyê ye. Nebûna vê derfetê tê wê wateyê ku desthilatdarî dixwaze rewşa heyî wekî xwe bimîne. Tecrîdkirina Rêber Ocalan naveroka pêvajoya aştiyê ya rastîn û pratîka wê vala derdixe.

Dewleta Tirk qanûnên navdewletî bi rengekî zelal û berdewam ji salên dirêj ve paşguh dike. Qanûneke navdewletî heye ku wekî "mafê hêviyê" ji bo hemû girtiyên cîhanê tê naskirin. Ev qanûn bi taybetî ji bo kesên ku cezayê girtîgehê yê hetahetayê yê li wan hatiye birîn e. Ev qanûn derfetê dide girtiyan ku piştî demekê çav li cezayê ku li wan hatibû birîn, were gerandin. Lê belê Tirkiye zêdetirî deh salên tije ne ku sepandina vê qanûnê red dike. Ev redkirin îsbat dike ku dewlet naxwaze deriyê hêviyê ji bo çareseriyê veke. Desthilatdarî mijara girtiyan her dem wekî amûreke zextê û manovraya siyasî ya berdewam bi kar tîne.

### Lawaziya saziyan û nebûna rêya demokratîk

Saziyên Ewropayê di vê dosyayê de pir hêdî û bêyî tu biryardariyekê tevdigerin. Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê berê ji bo guhertina helwestê dem dabû Dewleta Tirk. Diviyabû Tirkiyeyê qanûn bi cih bianiya û rêz li mafên girtiyên Kurd bi rengekî bilez bigirta. Lê belê Tirkiyeyê guh neda van deman û sîstema xwe qet neguhert. Sedema vê yekê di encamê de vedigere ser cewherê helwesta Ewropayê bi xwe. Yekîtiya Ewropayê berjewendiyên xwe yên siyasî yên taybet li ser pîvanên heq, hiqûq û edaleta mirovî re digire. Civaka navdewletî li ser hîmê hesabên siyasî yên sûdmend bi dewleta Tirk re tevdigere. Ev nêzîkatî qet pişta xwe nade qanûnên navdewletî yan jî mafên mirovî yên rewa. Desthilatdarên Tirk vê helwesta navdewletî ya lawaz û dudilî pir baş fêm dikin. Ji ber vê yekê, di polîtîkaya demdirêjkirinê û redkirina dayîna her tawîzeke rastîn de berdewam in. Zextên derve ji sînorên daxuyaniyên dîplomatîk û ragihandinê yên ku tiştekî nakin, dernakeve. Ev bêdengiya navdewletî çareseriya navxweyî di dema niha de dike tiştekî pir zehmet.

### Sekinîna meclîsê û dorpêçkirina muxalefeta siyasî

Meclîsa Tirk di vê qonaxê de di çêkirina guhertinê de bi temamî bêçare xuya dike. Berê komîsyonên parlamenê yên taybet ji bo xebata li ser pirsgirêka Kurd û lêgerîna çareseriyan hatibûn avakirin. Van komîsyonan raporên pir girîng pêşkêşî serokatiya meclîsa Tirk kirin, da ku gav biavêjin. Lê belê meclîsê tu qanûnên nû li ser hîmê wan raporan çênekirin. Her tişt tenê li ser kaxezê ma û di pratîka rastîn de nehate sepandin. Ev sekinandina qanûndanînê serweriya tam a desthilatdariya rêveber li ser biryarên meclîsê piştrast dike.

Di heman demê de, desthilatdariya heyî hewl dide ku muxalefeteke siyasî ya li gora berjewendiyên xwe ava bike. Partiya AKP'ê dixwaze reqîbên xwe lawaz bike û wan her dem ji bo xizmeta armancên xwe yên siyasî yên taybet bi rêve bibe. Lê belê pirsgirêka Kurd êdî bi hêzeke mezin zextê li ser hemû mofikên Dewleta Tirk dike. Ev pirsgirêk dibe sedema tengasiyeke mezin û zehmetiyên aborî û civakî ji bo desthilatdariyê û ji bo hemû Tirkiyê. Avêtina gavên wêrek ji bo çareseriyê wê xizmeta her kesî li Tirkiyeyê bike. Ev çareserî wê ji bo CHP'ê û ji bo hemû partiyên din ên muxalefetê pir bikêrhatî be.

### Komara Demokratîk Tekane Rê Ye Ji Bo Pêşveçûnê

Li Tirkiyeyê netewe, ol, çand û nasnameyên piralî û cuda ji demên kevnare ve bi hev re dijîn. Li wir bi milyonan Kurd hene ku daxwaza mafên xwe yên neteweyî dikin. Lê belê desthilatdariya heyî ji ber tirsa ku Kurd jê sûdê wergirin, van daxwazan red dike. Ev hişmendiya marjînalîzekirinê ya kevneperest ronesansbûna Tirkiyeyê asteng dike û rê li ber îstîqrar û pêşveçûna wê ya rastîn digire. Çareseriya rastîn di avakirina pergaleke komarî ya demokratîk a rastîn de ye ku her kesî di nav xwe de dihewîne.

Guhertina Tirkiyeyê ber bi komareke demokratîk ve wê hêzeke navxweyî û derveyî ya pir mezin bide Tirkiyeyê. Demokrasî wê Tirkiyeyê bike welatekî pêşkeftî û mezin, her wiha wê nirx û bandora wê ya herêmî û navdewletî zêde bike. Nebûna cudahiya di navbera welatiyan de û avakirina edaletê dawî li sedemên şerên navxweyî û pevçûnên berdewam tîne. Hemû hewldan û têkoşînên dilsoz çareserkirina pirsgirêkan di bin banekî demokratîk ê hevpar de armanc dikin. Naskirina mafan destpêkeke rast e ji bo avakirina pêşerojeke biewle û ronî ji bo hemû nifşên bê ye.

Di encamê de, em dibînin ku guhertina demokratîk a giştî bingeh û tevegera herî mezin e ji bo misogerkirina îstîqrarê li Tirkiyeyê. Berdewamiya polîtîkaya tecrîdê, demdirêjkirin û tundkirina dorpêçê wê pirsgirêkan çareser neke, berevajî wê wan hîn bêtir aloz bike. Divê meclîs, partiyên siyasî û muxalefet vê rastiyê bi rengekî tam fêm bikin. Avakirina komara demokratîk ku rêzê li hemû nasnameyan digire, derketina tenê ye ji vê tunela tarî. Naskirina mafên gelê Kurd gava yekem û bingehîn e ji bo bidawîkirina şer û avakirina aştiyeke mayînde û rastîn e.

# Serêkaniyê 8 sal piştî dagirkirinê: Koçberî, guhartina demografîk û hêviyên vegerê

Di 9'ê Cotmeha 2019'an de dewleta Tirk bi êrişa dagirkeriyê ku zagonên mirovî binpê dike, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê êrişeke dagirkeriyê pêk anî. Taybet armanca wan êrişan dagirkirina Serêkaniyê û Girê Spî bû, bi hinceta “avakirina herêmeke ewlehiyê” herdû herêm hatin dagirkirin. Serêkaniya ku 8 sal in di bin dagirkeriya dewleta Tirk de ye, îro gelê ku di kampan de dijîn li benda vegerek bi ewle ne.

**Tekoşîn Amara /Qamişlo**



Di 9 ‘ê Cotmeha 2019’an de dewleta Tirk bi êrîşa dagirkeriyê ku zagonên mirovî binpê dike, li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê êrişeke dagirkeriyê pêk anî. Taybet armanca wan êrişan dagirkirina Serê Kaniyê û Gîrê Spî bû, bi hinceta “avakirina herêmeke ewlehiyê” herdû herem hatin dagirkirin. Serê Kaniya ku 8 salin dibin dagirkeriya dewleta Tirk de ye. Îro gelê ku di kampan de dijîn li benda vegerek bi ewle ne. Di 29’ê Çileyê de peymana ku di nabera fermandarê QSD’ê û Serokê hikumeta Demkî Ehmed El Şera de hat imzekirin yek ji xalên vî peymanê vegera koçberan li heremên xwe bû. Koçberên Serêkaniyê ku 8 salin ku ji ber dagirkirina cîh û warên wan, li Kampên Serêkaniyê û Waşûkaniyê debara jiyana xwe dikirin. Pêştê vegera koçberên Efrînê, ew jî bi coş û kêfxweşiyek mezin li benda vegerê ne.

### Şer û koçberiya bi zorê

Bajarê Serêkaniyê ku dikeve herêma Cizîrê ya Rojavayê Kurdistanê, bajareke kevnar e, ku di dîrokê de bi navê “Waşûkanî” tê zanîn. Ji sala 2019’an heta niha dibin dagirkeriya dewleta Tirk ya dagirker de ye, ku hijmarek zêde çeteyên girêdayî xwe û malbatên wan, di cîh û warên gele, ku bi darê zorê hatiye koçberkirin kirine. Dewleta Tirk di sala 2019’an de di salvegera komploya 9’ê Cotmehê ya li ser Rêber Apo de, bi nûjenkirina komployê re êrîşê herema Bakûr û Rojhilatê Sûriyê kir. Taybet armanca hêzên dagirker Girêspî û Serêkaniyê bûn, ku bi awayek hovane bi tang, top, balafiran û bi çeken kîmyewî êrîşê Serêkaniyê kir. Di encama wan êrişan de bi hezaran gel koçberî Hesekê, gundewarên wê û Qamişlo yê bûn. Di sala 2020’an de ji bo koçberên Serêkaniyê û Girêspî kamp hatin çêkirin, zêdetirê 150 hezar kesên ku ji Serêkaniyê û Girêspî koçber bûne. Beşek ji wan koçberan li kampa Serêkaniyê beşek jî li kampa Waşûkanî hatine bicîh kirin.

### Kampa Waşûkanî

Kampa Waşûkanî 15 kîlometre dikeve Rojavayê bajarê Hesekê. Ev kamp di sala 2019’an de ji aliyê Reveberiya Xweser a Bakur Rojhilatê Sûriyê ve ji bo koçberên Serêkaniyê ve hat damezrandin. Li gor rapor û danehevan 24 hezar kes di kampa Waşûkanî de dijîn.

### Kampa Serêkaniyê

Kampa Serêkaniyê di sala 2020’an de li rojhilatê Hesekê hate avakirin. Ev kamp malbatên ku ji Serêkaniyê û Girêspî koçber bûne di hundirê xwe de dihewîne. Li gorê danehev û raporên ku hatine çêkirin, 16 hezar û 700 kes di kampa Serêkaniyê de dijin.

### Pişte dagikirinê guhertina demografik

Bajarê Serêkaniyê ku bi pirrengiya netewan dihat naskirin. Piştî dagirkirinê, veguheriye bajareke ku piraniya niştecîhên wê Ereb û Tirkmen in, pê re jî di demografiya Serêkaniyê de guhertinên mezin çêbûn. Komên ku ji bajarên cûda yên Sûriyeyê yên wekî Dêra Zor, Reqa, Îdlib, Hema û Helebê hatine anîn, li mal, erd û milkên Kurdan hatine bicihkirin. Ev rastiyek e ku wekî polîtîkayek ji bo guhertina demografiya bajêr derdikeve holê. Serêkaniyê di çarçoveya peymana ku di 29’ê Çile de di navbera Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) û Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê de hatiye îmzekirin de dîsa ketiye rojevê. Peyman vegera niştecihên resen ên bajêr, beşdariya nifûsa herêmî di rêveberiyê de û dabînkirina ewlehiyê ji hêla nifûsa herêmî ve pêşbînî dike.

### Peymana 29’ê Çileyê; hêviyên vegerê

Di 29’ê Çileya 2026’an de peymanek di navbera Fermandarê QSD’ê Mazlûm Ebdê û serokê hikûmeta demki Ehmed El-Şara de hat imzekirin de xalake giring li ser vegera koçberan bû. Lê piştî peymana 29ê Çile, hate dîtin ku Tirkiyê alên xwe li navenda bajêr daxist û hebûna xwe ya leşkerî kêm kir. Lêbelê, ev nayê wê wateyê ku ew bi tevahî ji bajêr vekişiyaye. Berevajî vê, tê gotin ku avahiyên îdarî û ewlehiyê di çarçoveya pergala ku ji hêla Tirkiyê ve hatî damezrandin de ji nû ve hatine organîzekirin. Îro, avahiya li Serêkaniyê, di bin navê “Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê” de di pratîkê de wekî sîstemek, ku Tirkiye tê de roleke diyarker dilîze, dixebite. Serêkaniyê ji aliyê îdarî ve navçeyek Hesekê ye. Li gorî peymana 29ê Çile, divê rêveberiya navçeyê ji nifûsa herêmî were hilbijartin û bi fermî ji aliyê Waliyê Hesekê ve were tayînkirin. Lêbelê, ji ber şert û mercên heyî, ev pêvajo nayê cîbicîkirin.

Li gorê hin çavkaniyan berya demeke, kesekî bi navê Abdullah el-Ceş’am ji aliyê Tirkiyeyê ve wekî qeymeqamê navçeyê hate tayînkirin. El-Ceş’am, ku tê gotin bi eslê xwe Ereb e, li gorî agahiyan ew ji erebên Mexmûrî (qemmerî) ye, ku di bin polîtîkayên “Kembera Erebî” a rejîma Baasê de li herêmê bi cih bûne. Ev tayînkirin bûye sedema nîqaşan li ser temsîliyeta herêmî û rewatiya wê.

### Veger tê nîqaşkirin

Her çend daxuyaniyên fermî îdia dikin ku Tirkiyê hebûna xwe li navenda bajêr kêm kiriye jî, rewşa li ser erdê tevlihevtir xuya dike. Li Serêkaniyê, rêveberî bi awayekî eşkere ji hêla komên çekdar ên ku ji hêla Tirkiyê ve têne piştgirî kirin ve tê rêvebirin. Artêşa Tirkiyê li ser xeta di navbera Til Temir û Serêkaniyê de, li nêzî rêya M4, baregehên leşkerî hene. Ev baregeh, li dora gundên Ayngil el Hewa, Babil Ferac, Mekke Davud, û Karşi Aliya li nêzî xeta Ayn Issa ne, ji sala 2019an vir ve bi giranî hebûna xwe didomînin. Ev hebûna leşkerî bandora berdewam a Tirkiyê li herêmê nîşan dide. Koçberên Serêkaniyê li bendê ne ku li gorî şertên peymana 29`ê Çileyê vegerin bajar û gundên xwe, Lê belê, nebûna ewlehiyê ya domdar di nav bajar û gundewarên derdora wê de, li pêşiya vegera wan astengî ye.

Li gorê daxuyaniyên fermî amedakarî didomikin ji bo vegera koçberan. Endama komiteya Serêkaniyê Ciwan Hiso diyar kir bû ku heta niha 14,000 kesan ji bo vegerê serlêdan kirine.

### Astengiyên sereke yên li pêşiya vegera koçberên Serêkaniyê ev in:

* Rewşa leşkerî ya heyî li herêmê.
* Nebûna garantiyên ewlehiyê.
* Pirsgirêkên milk û erdê.
* Bikaranîna xanî û erdê ji hêla komên cuda ve.
* Wêrankirina berfireh a binesaziyê.

FENER



Idrîs Henan

## Veger Serkeftina Bîr Û Hebûnê Ye

Veger wek têgeh, bizaveke tevgerînê ye û parçeyek bingehîn a liv û tevgera mirovahiyê ye. Di wateya xwe ya zimanî de jî; tevger an jî vegera li xala yekem a derketinê ye. Wateya vegerê ya razber jî xwe dispêre hişmendî û îdeolojiya derketinê. Ango; li gorî şêweyê derketinê, veger jî maneyê li xwe bar dike û bi gewde dibe. Bi gotinek din; veger hem pirseke siyasî, hem civakî û hem jî derûnî ye. Ji bo civakeke bi zorê hatiye koçberkirin, dagirkirin an jî bi siyaseta guherîna demografîk re rû bi rû mayî re, veger tenê vegera mirovan bo mal û welat nîne; ew vegera maf, bîr, çand, ziman û girêdana civakî ye.
Çendî koçberiya bi zorê diyardeyek kirêt û krîtîk be, lê qet nabe qederek. Dema ku mirovek an jî komek mirovan bi zorê yan jî bi dilxwazî welatê xwe terk dikin an jî tên derbederkirin, hêviya vegerê pê re vêdikeve û li ser wê bendewariyê jiyana xwe ya qonaxa nû dewam dikin. Bendewariya koçberên bi zorê jî ew e ku; veger girêdayî guhertin û başbûna şert û mercên ku ew tûşî derketinê kirine ye.
Li vir divê têgihiştineke giştî hebe ku veger hewceyî piştgiriyeke taybet e heta karibe civakeke hevgirtî ava bibe û sûdê bi her kesî re parve bike. Yanê divê yên derve û yên hundir xwedî wê asta zanîn û têgihiştinê bin ku karibin ji nû ve entegre bibin û civakeke yekgirtî ava bikin da ku rê li ber hemû cureyên parçekirin û hewldanên fitne û dijberiyê bigire.
Li dijî siyaseta qirkirinê, veger têkiliya gel bi axê re diparêze, bîra kolektîf zindî dihêle û di heman demê de ziman û çanda gel ji wendabûnê xilas dike. Aliyekî din jî mafê dîrokî û yasayî zindî dimîne û her wiha pêşî li mayîndekirina encamên koçberkirina bi zorê digire. Yanê veger tenê vegera laş bo cîhekî nîne, lê belê vegera nasname û hêviyê ye. Gava ku miletek ji axa xwe tê derxistin, bê guman armanc ne tenê valakirina cîhekî cografîk e. Lê belê qutkirina têkîliya gel bi ax û bîra xwe re ye. Ji lew re jî veger girîng e, çimkî ew têkîliya qutbûyî ji nû ve zindî dibe, xwîn di rehên ziwabûyî de diherike û pêşî li çilekî û azweriyên dagirkeran tê girtin.
Ya herî girîng ev e ku têkîliya navbera endamên heman civakê de, li ser hîmên welatparêziyê, ji nû ve were sererastkirin û rêsandin. Divê ev yek bi gotûbêj, hevbihîstin, parvekirina êş û ezmûnan, û projeyên hevpar ên çandî û civakî bi armanca parastina hebûnê pêk were ku ew tevn û yekîtiya civakî were parastin. Hevdufêmkirin û rêzgirtina ji hev re jî pêwîst e. Êşên koçberiyê û kiryarên dagirkeriyê hestên mirovan birîndar dikin û têkîliyên wan xera dikin. Hestên hesretê, şînê, hêrsê û nedadiyê zû bi zû nayên dermankirin. Divê herdu aliyên hundir û derve hestên hev qebûl bikin û bi hev re pêvajoyeke xurt a parastina ziman, çand û bîra giştî dest pê bikin, da ku karibin ji tecrubeya xwe sûdê werbigirin û pêşerojek azad misoger bikin.
Pêwîstiya vê yekê jî bi hebûna civakeke rêxistinkirî heye ku rê li ber planên dagirkeriyê, siyasetên asîmîlasyonê û guhertina demografîk bigire. Civaka rêxistinkirî avantaja parastina hebûnê bi dest dixe, dîroka xwe belge dike û nifşên nû bi hişmendî û zanînek azad mezin dike. Domandina gelekî jî girêdayî vê avantajê ye.
Di encamê de; veger di wateya xwe ya kûr de, vegera mirov bo xwe ye. Bi vegerê re hêvî zindî dimîne, rê li ber qirkirinê tê girtin, pêşerojek azad misoger dibe, ziman, çand û dîrok tên parastin û têkoşîna lêgerîna mafan bi rêyên yasayî, siyasî û sivîl mezintir dibe.



# Jina ciwan ku di temenê xwe yê biçûk de pirtûkek îmze kir

Jina ciwan Yasmîn Ebas ku ev yekemîn care pirtûkekê di temenê xwe yê biçûk de bi hêz û hezkirinekê çap dike. Xwesteka Yasmîn jî ji pirtûkê re ew e ku her nifşekî nû sûdê jê bigire.

**Aylîn Ehmed/ Qamişlo**



Jina ciwan Yasmîn Ebas ku bi temenê xwe 23 ê salî ye. Ew li bajarê Tirbespiyê ji sala 2003’an de jidayik bûye û ew niha li bajarê Tirbespiyê jiyan xwe berdewam dike. Yasmîn wek jina ciwan niha ew mamosteya ziman û wêje li Zanîngeha Rojava ya li bajarê Qamişlo ye. Berî xwendin, qonax û jiyana li zanîngeha Rojava Yasmîn di temenê xwe yê biçûk de fêrî zimanê dayikê bû û bi zimanê xwe xwend, li ba Yasmîn pirtûkên Seydayê Tîrêj û Keleş hebûn û heya ku mezin bû jî ew pirtûk li ba xwe hêla. Yasmîn di temenê xwe yê biçûk de helbestên pirtûka dixwendin, piştire hêdî hêdî meyîl û hizira wê çû li ser awayê helbestê. Ew pirtûkên ku wê dixwendin jî piranî li ser hezkirin, netewperwerî û kurdewarî bûn, ev pirtûk hêla ku zimanê kurdewarî yê Yesmîn bi pêş bikeve.

Piştî xwendina Yasmîn ya Amadayî, meyîl û dilê wê di helbestan û wêjeya kurdî de hebû ji ber vê yekê wê ev beş hilbijart û dest bi xwendina vî beşî di Zanîngeha Rojava de kir. Piştire dema ku Yesmîn beşê xwe yê wêje di Zanîngeha Rojava de bidawî kir û der çû, êdî ew bû mamosteya ziman û wêje di fakorteya ziman û wêje di Zanîngehê de.

Ji ber hezkirina Yasmîn ji pirtûkan re, wê xwest ku pirtûkekê çap bike. Piştire Yasmîn bi hezkirin û helwesta xwe bi alîkariya şêwermendê wê Aram Hisên, rewşenbîr û nivîskar, helbestvanê nemir mala Ehmedê palo her dû lawên wî mamoste Rêzan Palo û Seyîd Palo jî di pirtûkê de bi Yesmîn re bûne alîkar û pirtûka wê girtin dest û çap kirin.

Pirtûka ku Yasmîn bala wê kişand û agahî li ser wê kêm dîtin, ew helbestvan Ehmedê Palo ku helbestvanekî kurd û hêja ye û wî jî kar û xebateke mezin di ziman û wêjeya kurdî de kiriye, Yasmîn jî xwest ku li ser wî helbestvanî pirtûkekê binvîse ji ber ku didît agahî li ser kêm bûn û di nava civakê de hatiye veşartin, ji ber wê xwest ku pirtûkê li ser binvîse û bihêle ku bala her kesekî din jî weke wê bikişîne.

Pirtûka Yasmîn ya li ser helbestvan Ehmedê Palo ji sê beşan pêk tê, peşa destpêkê li ser berhem û jiyana Ehemedê Palo ye, beşê duyem jî li ser netewperwerî hem pênase û hem jî tewriyên wê ye û beşa sêyem jî dahurandina helbestan ne. Helbestvan Ehmedê Palo ku heya niha 4 berhemên wî hatine çapkirin. Tevahî helbestên wî li ser doz, yekîtî, zimanê Kurdî û netewperweriyê ne, di gotina xwe de jî Ehmedê Palo bang li kurdan kiriye û wiha aniye ziman “Kurdino hişiyar bibin, bi zimanê xwe xwedî derkevin, bi zimanê xwe yê dayikê bixwînin” û hwd gotiye. Ev gotin her tim bala Yasmîn dikişandin wê jî xwest ku bala her kurdekî jî bikişîne.

Yasmîn dema ku agahiyên xwe yên derçûyînê kom kiribûn û di nava pirtûka ku çap kirî nivîsî bûn, xwesteka wê ew bû ku ew pirtûk di nava miletê kurd de û nifşên di dû wê de sûdê ji wê pirtûkê bigirin. Dema ku Yasmîn dest bi lêkolîna pirtûkê kir gelek zehmetî dîtin heya ku agahî dan ber hev, ji ber wê dixwest ku her kes sûdê ji keda wê bigire. Yasmîn bi wê pirtûka xwe ve 7 mehan pê re dirêj kir heya ku çap kir. Pirtûka Yasmîn jî ku ji 139 rûpelan pêk dihat ji aliyê HRRK’ê ve hate çapkirin. Dema ku hat çapkirin jî êdî di 24 meha 5 an de îmze kir û hat belavkirin. Daxwaza Yasmîn ji bo rojên pêş ew e ku kar û nivîsandina xwe berdewam bike. Her wiha hêviya Yasmîn jî wek ciwaneke Kurd ku her nifşekî li dû wê ew jî xwesteka çapkirina pirtûkan bidin pêşiya xwe, ji ber ew yekem car bû ku pirtûkek çap kir û pir kêfxweş bû, di riya wê kêfxweşiyê re zehmetiyên xwe yên pirtûkê jibîr kirin.

# ‘Girêdana zarokan bi muzîkê re xurt bûye’

**Navenda Nûçeyan**

**Berpirsê Komeleya Yek Par a Çand û Hunerê Beyar Dîno diyar kir ku ew hemû perwerdeyên beşên muzîkê di navendê de didin û wiha got, “Di dema heyî de girêdana zarokan bi muzîkê re xurt bûye. Pêşketina zarokan jî cihê kêfxweşî û şanaziyê ye.”**

Navenda Yek Par a Çand û Hunerê saziyeke çandî û hunerî ya çalak e li bajarê Qamişlo, ku xebatên hunerî, wêjeyî û çalakiyên civakî bi rê ve dibe. Navend di warê pêşxistina hunera herêmî û lidarxistina çalakiyên çandî de rolek girîng dilîz e. Bi taybetî di milê perwerdekirina zarokan de gavên girîng hatine avêtin.
Di derbarê mijarê de Berpirsê navenda Yek Par a Çand û Hunerê Beyar Dîno ji Rojnameya me re axivî.

### ‘Di navendê de beşa herî girîng ya zarokan e’

Beyar di destpêka axaftina xwe de bal kişand li ser xebatên navenda Yek Par û wiha anî ziman: “Wek ku tê zanîn navenda Yek Par navenda çand û hunerê ye, di navendê de perwerdeyên muzîkê yên mîna tembûr, baxleme, keman, gîtar, piyano û hwd têne dayîn. Di navendê de 13’ de endam hene ku her yek ji wan beşê xwe yê muzîkê birêve dibe. Her wiha ev navend ji beriya 6 salan ve, bi xwe bixwe xwe bi rêve dibe, beşa herî girîng jî di navendê de beşê perwerdeya zarokan ne, ji ber ku zarok ji bo me her tiştin. Îro zarok pêşeroja me û ya hemû gelan e, ji bo vê yekê me bêtir girîngî daye zarokan û her wiha çi ji destê me derkeve jî em ê ji bo van zarokan bikin. Beşên hunerê di navendê de mîna şêwekarî, şano, muzîk û govend hene ku li ser wan zarok perwerdeyên xwe dibînin.”

### ‘Zarok pir bi mûzîkê ve mijûl in’

Beyar di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku zarok pir bi muzîkê ve mijûl in û wiha got: “Di vê demê de girêdan û mijûlkirina zarokan bi muzî re pir heye, ev yek jî cihê kêfxweşî û şehnaziyê ye. Ji xwe bi giştî di Rojavayê Kurdistanê de hinekî pirsgirêk heye ku malbatên zarokan êdî berê zarokên xwe tênê didin muzîkê. Tevî ku 6 beşên din jî hene. Lê malbat dixwazin zarokên fêrî beşên muzîkê yên mîna tembûr, gîtar û hwd bibin, ji ber vê yekê beşê xwe yê hunerê yên din jibîr dikin. Ji bo vê em navenda Yek Par bi hêvî ne ku zarok berê xwe bidin tevahî beşên hunerê.

Niha jî di navendê de gelek zarok gihiştine asteke baş. Navend jî her sal bi navê “Meyîlûdiyên Payîzî” bi fistîvalan radibe, di wir de tevahî zarokên Yek Par di aliyê şano, şêwekarî û muzîkê de beşdar dibin. Ji bilî perwerdeyan navenda Yek par bi zarokên navendê re alîkarî bi amûrên xwe yê muzîkê belav dikirin, ku çi tiştekî hebe navend beşdar dibe û kêfa zarokên din jî tînin.”

### ‘Rojên me yên perwerdeyê diyar in’

Beyar Dîno da xuyakirin ku ew di rojên diyar de perwerdeyan didin û wiha bidawî kir: “Em navenda Yek



Par hemû perwerdeyên xwe yên muzîkê rojên Yekşem û Sêşeman didin. Her wiha rojên şemî û çarşeman perwerdeyên şano didin û rojên duşem û pêncşem jî beşê şêwekariyê ye. Tenê perwerdeyên me yên muzîkê ji seat 2 dest pê dike û heya seat 8’ê êvarî bidawî dibin û yên beşên din ji seat 2’ê nîvro dest pê dike û heya 5 bidawî dibin. Zarokên ku tevlî navendê dibin ji 6’ salî û bi jor de ne, dema ku tên jî em wan tevlî beşa ku dixwazin dikin. Ji ber ku navenda Yek Par demên pêş nema karibû xwe bi rêve bibe êdî navend bû bi fonan, lê her endamek em li gor derfetên ku dikarin didin û me ji wan re diyarkirine didin. Me dixwest ku navend bê fon bin, lê ji ber ku navendeke serbixwe bû û bi tu saziyan ve negirêdayî bû tim di gelek astengiyan re derbas dibû ji ber vê yekê êdî me xist bi fonan.”



Remezan Olçen

## Çîrok-welat

Sedsala me, zemanê herî sar ê birînên kevn e. Em di sedsaleke wisa de ne ku tê de ne tenê sînorên fîzikî, herî zêde hişmendî û canê mirovan tê dagirkirin. Weke gelekî ku rûmeta wî di bin herriya dîroka serdestan de hatiye hiştin, Kurdan her gav penaberiya deryaya çîrokan kiriye. Çîrok, di şevên me yên reş û tarî de, xaniyên me yên hifzkirî bûn; li wir zimanê me dilerizî, li wir çiyayên me winda nediçûn û li wir welatê me di dilê me de zindî dima. Îro pirs ev e: Gelo em dikarin wan şevên mîstîk û mîtolojîk bikin sibeheke rewşenbîrî ya ku civakekê û welatekî ji nû ve ava dike? Gelo pênûs dikare bibe fîşala şiyarbûnê?
Grigory Petrov gava ku di pirtûka xwe ya navdar “Li Welatê Zembaqên Spî” de behsa şiyarbûna ecêb û bêhempa ya gelê Fînlandê dikir, fîşala yekem neda destê leşkeran, da destê ehlê pênûsê. Wî behsa biryardariya mamosteyan, bijîşkan û rewşenbîran dikir ku gund bi gund geriyan û ji rûmeteke perçepûçkirî, neteweyekî şanaz û azad afirandin. Fînlanda ku herêmeke herî li paş mayî, xizan û xofdar bû, bi destê herketeke rewşenbîrî veguherî baxçeyê zembaqên spî. Îro rûpela dîrokê li ber destê me Kurdan e. Ji bo rewşenbîr û nivîskaran, rizgariya ji bindestiyê ne tenê girtina çeperên fîzikî ye; rizgariya herî rasteqîn û mayînde, rizgarbûna hişmendiya civakê ye ji çolbûna kapîtalîzmê, ji tirsê û ji windabûna nasnameyê.
Ji bo ku ev hewldana rewşenbîrî nebe tenê xeyaleke li ser kaxizê, ji me re ronahiyek û paradîgmayeke kûr hewce ye. Ew fenera ku rêya me di nav vê deryaya tarî de ronî dike, paradîgmaya Rêber Apo ya ku xwe dispêre civaka demokratîk, ekolojîk û azadiya jinê ye. Ev felsefe ne tenê teoriyeke siyasî ye, nexşeyeke hunerî û ruhî ye ku jiyanê ji nû ve disêwirîne. Dema ku pênûsa rewşenbîrekî bi ruhê vê paradîgmayê re dibe yek, êdî nivîs nabe tenê rêzkirina tîpan, dibe avakirina şaneyên welatekî azad.
Di vê sêwiranê de, gava yekem a herî pîroz ziman e. Ziman, ne tenê amûreke ragihandinê ye, ew nexşeya ruhî ya gelekî ye. Dema em çîrokên dayikên xwe, kilamên dengbêjên xwe û lehengiyên vê axê bi Kurmanciyeke herikbar û zelal dinivîsin, em sînorên asîmîlasyonê parçe dikin. Her çîrokeke ku tê nivîsandin, derziyeke ku di dilê dagirkeriyê de tê çikandin. Bi rêya çîrokan, zarokên vî welatî fêrî xewnên bi zimanê xwe dibin, û gelê ku bi zimanê xwe xewnan nebîne, nikare paşeroja xwe ava bike.
Lê belê, ev hewldana rewşenbîrî gava ku berê xwe dide kûrahiya paradîgmayê, stêrka xwe ya herî geş di asmana azadiya jinê de dibîne. Di maqaleyên me û di çîrokên me de, jin ne qurbana çarenûseke reş e; ew pêşenga ramanê, avakara jiyanê û ruhê azadiyê ye. Civaka ku jina xwe di qefesên hişmendiya feodal û kapîtalîst de bihêle, sînorên xwe yên azadiyê her gav teng dike. Huner û çîrokên ku jina azad dikişînin navenda jiyana nû, bingehê herî saxlem ê civakeke rûmetdar in. Sêwirana jiyanê bi destê jinê, rengê herî bedew ê vî welatî ye.
Herwiha, nexşeya vê azadiyê bêyî hezkirineke ekolojîk kêm dimîne. Parastina xaka Kurdistanê, parastina her kaniyeke ku li çiya û deştan diherike û parastina darên ku sîberê didin ser dîroka me, bersiva herî pîroz e li hemberî hişmendiya talanker. Hareketa rewşenbîrî divê fêrî me bike ku em axê ne tenê mîna mal milk, lê mîna canê xwe hembêz bikin.
Dibe ku îro welatê me hîn jî di bin birînên giran de dinale, lê hêza pênûsê ji hêza sînoran mezintir e. Gava ku tevgera me ya rewşenbîrî felsefeya jiyaneke nû di nav ruhê civakê de biçîne, sibe wekî sêwiraneke hunerî, her gund û bajarekî me wê bibe baxçeyê gul û kulîlk û zembaqên azad. Çîrokên me ne tenê ji bo xemgîniyê ne; ew nexşeya rêya me ya ber bi rûmet, azadî û jiyaneke nû ve ne. Ev şoreş, şoreşa pênûs, raman û hişmendiya azad e.

# Nirxên elektrîkê duqat zêde bûye; Barê welatiyan jî girantir bûye

Nirxê elektrîka giştî li bajarê Dêrikê yê Rojavayê Kurdistanê duqat bilind bûye, nirxê her kîlowateke elektrîkê ji 2 sentan bûye 4 sent. Ji ber wê jî welatî gazinan dikin û bi hêvîne ku nirxeke guncav li gorî rewşa aborî bê dayîn.

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Elektrîk di jiyana nûjen de wekî rûberekî bingehîn e ku bêyî wê jiyana rojane û pêşveçûna mirovahiyê radiweste. Ew ne tenê çavkaniyek enerjiyê ye, lê bingeha herî mezin a şaristaniya serdema me ye. Elektrîk êdî ne tenê amûrek ji bo ronîkirina şevê ye, ew bingeha perwerde, tenduristî, ragihandin û pîşesaziyê ye. Dema ku elektrîk qut dibe an kêm dibe, jiyana aborî radiweste û karûbarên bingehîn (mîna nexweşxane û sîstemên avê) dikevin bin xetereyê. Ji ber vê yekê, dabînkirina elektrîkê bi bihayekî guncan, mafekî bingehîn ê her mirovekî ye. Gava elektrîk biha dibe, nirxê xwarin, cil û hemû kelûpêlên ku têne hilberandin jî bilind dibe. Gelek malbat nikarin fatoreyên xwe bidin, ku ev dibe sedem ku ew di sermayê an germayê de bê parastin bimînin.



Serpel Mehmûd



Xezal Hacî

Di derbarî buhabûba nirxên elektrîkê li bajarê Dêrikê Hevserokê Navenda Elekitrîkî ya bajrê Dêrikê Serpel Mehmûd û hemwelatiya bi navê Xezal Hacî ji Rojnameya me re axivî.

**'Pêwîste biryara bilindbûna nirxên elektrîkê were guhertin'**

Serpel Mehmûd da zanîn ku piştî ku entigrasiyon çêbû û hikumeta demkî serlêdana navenda me kirin biryara buhabûna nirxên elektrîkê derxistin û wiha got: "Destpêkê nirxê elekirtrîkê li herêma me bi sentekî bû û ev buha guncaw bû ji hemû kesan re û tu gazinên gel nebûn. Lê piştî ku endamên elektrîkê yên girêdayî hikumeta demkî serlêdana me kirin û nerazîbûna xwe nîşan dan ku li bajarên din wek Şamê buhayê elektrîkê bi 10 sentaye lewma li herêma me jî kirin 4 sent. Ev yek zirar gihand gel bi taybet kesê hejar ji ber ku beramberî vê biryarê biryara bacê heye ku pêwîste her malek 150 kêloyî tenê bikar bîne heger zêdetir be pêwîste serlêdana me bike, êdî em 180 hevdanê 1400 dikin cûdahiya wê çiqas bê em jî wî kesî distînin, ev biryar ne di cihê xwe de ye ji ber ku bi welatiyan ne fikirin wê rewşa wan çawa bê gelek kes hene wê bimînin bê elekitrîk ji ber ku nikarin bacê bidin. Ez jî yek ji vî gelî me û nerazîbûna xwe nîşan didim ji bo vê biryarê, bi hêvîme ku guhertin têde çêbibe û biryareke guncaw were derxistin, ji ber ku gelek kesên hejar hene û nikarin vê biryarê pêk bînin."

**Êşa gel zêdetir bûye sedema bilind bûna elektrîkê**

Hemwelatiya bi navê Xezal Hacî anî ziman ku elekitrîk, av û sotemenî ji bo civakê bingehe qutbûna wan û bilind bûna nixrên wan tê watedar ku tunekirina civakê û wiha got: "Dema şoreşa Sûriyê dest pê kir û li seranserî Sûriyê kirîza av, elekitrîk û sotemeniyê belav bû herêma me rewşa wê baştir bû ji ber ku li vir gelek enefat hene ku ew bixwe elekitrîkê didin herêmê û ne hewceyê elekitrîka jiderve ne, lê îro roj biştî hilweşandina rêjîma Baas em di wê baweriyê de bûn ku wê rewş baştir bibe, lê berûvajî wê em dibînin. Kirîza ku ev 15 sal bû me xwe jê diparast îro roj li ser me pêk tê, bikar anîna elekitrîkê ji bo me bû hisretek piştî biryara buhabûna nirxê wê. Tevî ku niha em di demsala havînê dene û germahî zêdeye, lê ji bo me ava sar û vêxistina kondîşan hisrete, heya ku em xwe ji bacê biparêzin em ê ji jiyanê mehrûm bibin. Em dengê xwe dighînin hemû saziyên eleqedar da ku xwedî li vî gelê derkevin û çareseriyekî jî vê rewşê re bibînin û nirxê elekirtîkê were guhertin û biryara bacê were rakirin."

# Zêdebûna kolandina bîrên bêserûber û xeteriyên wê

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Ji ber kêmbûna avê di salên borî de û ji bo peydakirina avê diyardeya kolandina bîrên bêserûber di nava kolanên bajarê Qamişlo de zêde bûye. Ev yek jî dibe ku gelek metirsiyan bi xwe re bîne; wekî kêmbûna asta ava binerd û belavbûna nexweşiyan ji ber neguncavbûna cihên kolandinê.**

Av yek ji çavkaniyên herî girîng e ku mirov di jiyana xwe ya rojane de pê ve girêdayî ye. Herwiha ew hêmanek girîng e ji bo parastina tenduristiya giştî ya civakan e. Ji ber aloziya avê ya mezin ku gelê herêma Cizîrê êş jê kişand, gelek şênî û malbat neçar man ku berê xwe bidin kolandina bîran di hundir an jî li pêşiya malên xwe, da ku avê ji xwe re peyda bikin.

Di dema dawî de jî diyardeya kolandina bîran bêyî girtina destûrê ji aliyên peywendîdar zêde bûye, di çarçoveya rawestandina komîteyên çavdêrî û şopandinê ji ber tedbîrên entegrasyonê û ji nû ve avakirina heykeleya îdarî.

**Xeteriya kolandina bîrên bêserûber**

Ji xwe xeteriya kolandina bêserûber a bîran, dibe cihê metrsiyê û bandoreke neynî li ser ava bierdê û li ser depoya avê, dike. Ji bilî xeteriya kolandina di cihên ne guncav de, hem li ber kanalîzasyonan an jî cihên avqirêjiyê ku dê bandoreke mezin li ser jiyana mirovan bike ji hêla tenduristiyê, dibe ku ava qirêj bikeve nav ava bîran û di encamê de gelek nexweşiyên nebaş derkevin holê.

**Hişyarî**

Diyardeya kolandina bîrên bêserûber dibe ku encamên xirab ji bo jîngehê û avê di salên pêş de bi xwe re bîne û aloziya avê derxîne holê, herwiha nêzîkbûna kolandina bîran li cem hev dibe ku zextê li ser depoya ava bierd bike di heman demê de gefê li ser rêjeya avê û zuwakirina kaniyan bike.

Hin bîr têne kolandin tenê 20 mître di navbera wan de ye, ev cure kolandin gefê li ser domandina çavkaniyên avê di pêşrojê de dike, bi taybet eger rêjeya baranê kêm bibe. Ev rêbaz ji kolandinê metrsiyên jîngehî bi xwe re tîne, wekî çêbûna valahiyan di nava axê de di nava herêmên niştecihbûnê ku dikare gefê li hin avahiyan bike. Herwiha çêbûna qirêjiya avê di encama ketina avê di nava çînên xwêyî di hundirê erdê de.

**Kolandina bîran bêyî girtina destûrê**

Gelek şênî di dema dawî de ji ber destpêkirina pêvajoya entergrasyonê, nema berê xwe didin aliyên peywendîdar da ku destûrê bigrin berî kolandina bîran.

Li gorî ajansa ANHA'yê ku agahiyên xwe ji Daîreya Avê û saziya çandiniyê girtiye, bi hevahengiya êrişên ku komên girêdayî hikumeta demkî ya Sûriyê li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê pêkanên, bi dehan ji alavên taybetî kolandina bîran derbasî herêma Cizîrê bûne. Di heman demê de Daîreya Avê destnîşan kir ku gelek proseyên kolandinê bêyî girtina destûrê hatin kirin, lê ew dema ku giliyan ji şêniyan digirin destwerdanên dikin û tîmên



çavdêrî û şopandinê dişînin da ku xebatên muxalif rawestînin. Herwiha hate zelal kirin ku çend bîrên muxalif jî rawestandin e.

Daîreyê bang li welatiyan kir ku bi awayekî tavilê her xebata kolandinê di nav bajarê Qamişlo an derdora wê de tê kirin, ragihînin, bi armanca kêmkirina kolandina bêserûber û parastina çavkaniyên avê.

Di vê derbarê de jî Şaredariya Gel a Bajarê Qamişlo biryarek derxist, tê de tekez kir ku saziyên giştî û xizmetên şaredariyê bi awayekî normal xebatên xwe berdewam dikin herwiha destnîşan kir ku hin kes û sazî bi pratîkên nezagonî mijûl bûne, wekî kolandina bîrên bê destûr, pêkanîna avakirina bê destûr û destdirêjiya li ser milkê giştî, bi sûdwergirtina ji têgihîştineke şaş a rewşa heyî.

Şaredariya Qamişlo diyar kir ku ew her binpêkirinek li derveyî çarçoveya zagonî hatiye kirin red dike, heriwha raghand ku ew ê tedbîrên zagonî û rêveberî li dijî her kesê ku bandorê li rêziknameya giştî an berjewendiya giştî de beşdar be, bigire.

Her wiha Şaredariya Gel a Bajarê Qamişlo bang li welatiyan kir ku danûstendinên wan yên têkildarî kolandina bîrên avê, destûrên avakirinê, xizmetên binesaziyê û plansaziya bajarî bi rêya kanalên fermî temam bikin.



# Xalid Omer: Divê destûra sabit bi beşdariya wekhev were nivîsandin

Parêzer Xalid Omer destnîşan kir ku danezana destûrî ya niha mîna destûra Baasê bi rengekî navendî ye ku tenê îradeya desthilatdariya heyî temsîl dike. Destûra siberojê divê bi beşdariya hemû pêkhateyan were nivîsandin, mafên neteweyî û çandî were parastin, pergala rêvebirinê jî li ser bingeha demokrasî û nenavendîbûnê were avakirin.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**



Derbarê destûra Sûriyê ku beriya niha dihat meşandin, herwiha destûrê demkî yê ku piştî hilweşandina rejîma Baasê ji aliyê hikumeta demkî ve hate ragihandin û ji bo destûrê daimî ku divê bi çi awayî were nivîsandin, parêzer Xalid Omer bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Destûra Sûriyê ya di serdema Bassê de çawa bû û bi çi rengî hatibû nivîsandin, bi giştî nirxandina te li ser vê yekê çi ye?**

Berî hatina HTŞ'ê ser desthilatdariyê, destûra ku li Sûriyê derbasdar bû, destûra rêjîma Baasê bû. Ew destûrekî ku bi rengekî navendî welat bi rê ve dibir û pirrengiya civaka Sûriyê li ber çavan nedigirt. Hemû kes wek neteweya ereb dihate dîtin, lê pêkhateyên wekî Kurd, Xiristiyan, Çerkez û Ermen bi taybetî nehatibûn naskirin. Yanî ew destûrek bû ku desthilatdarî li gorî berjewendiyên xwe nivîsandibû, ne li gorî berjewendî û daxwazên civaka Sûriyê û pêkhateyên wê. Ew tenê destûrek bû ku berdewamî û berjewendiyên desthilatdariya rêjîma Baasê misoger dikir û ji bo wê garantî pêk dianî, ne ji bo parastina mafên gelên Sûriyê. Li ser vê bingehê, ew destûr ne destûrekî demokratîk bû û ne jî ji bo gel bû, ji bo parastin û domandina desthilatdariyê bû.

**Piştî hilweşandina rêjîma Baasê, hikumeta demkî ya Sûriyê ya niha danezan an jî destûrekî demkî ragihand, gelo ev destûr nûnertiya hemû gelên Sûriyê dikir an na û destûrekî çawa bû?**

Ev danezana destûrî an jî destûra demkî qet ne li gorî berjewendî û daxwazên gelên Sûriyê û ne jî li gorî prensîp û armancên Şoreşa gelên Sûriyê ye. Em çima vê yekê dibêjin? Ji ber ku ev danezana destûrî ne ji aliyê kongreyeke niştîmanî ya ku hemû pêkhateyên Sûriyê tê de temsîl bibin, hatiye amadekirin û derxistin. Tenê Heyet Tehrîr el-Şam (HTŞ) û alîgirên wê ev danezana destûrî ji bo xwe nivîsandine. Ev danezana destûrî pirrengiya civaka Sûriyê nabîne û bi rengekî yekalî hatiye nivîsandin, herwiha ew tekez dike ku Sûriyê komareke erebî ye. Ev jî, wekî ku di destûra kevn de hebû û niha jî di vê destûra demkî de dubare dibe, ev jî tê wê wateyê ku hebûna gel û pêkhateyên din ên ne ereb ku wek gelên resen di hundirê Sûriyê de dijîn, nayê qebûlkirin an jî nayê dîtin. Herwiha, di vê destûrê de piraniya desthilatan di destê Serokkomar de kom dike, tu kar û bar ji kesekî din re nehiştiye. Ji ber ku biryarên sereke, hem di destpêkê de hem jî di dawiya pêvajoyan de, di destê Serokkomar de dimînin. Ji vî aliyî ve, ev destûr di cihê xwe de pir dişibe destûra kevn. Her du destûr jî, hem di nedîtina pirrengiya gelên Sûriyê de û hem jî di pejirandina rêveberiyeke yekalî de, nêzî hev in. Em nabînin ku ev danezana destûrî îradeya hemû pêkhateyên Sûriyê di xwe de dihewîne. Ew tenê îradeya desthilatdariya heyî, ango îradeya HTŞ'ê temsîl dike. Heta ne hemû Erebên Sûnî jî xwe di vê destûrê de dibînin, tenê beşek ji Erebên Sûnî yên radîkal hinekî temsîla xwe di hundirê vê destûrê de dibînin. Lê ji bo hemû pêkhateyên din ên Sûriyê, ne îradeya wan û ne jî cihê wan di hundirê vê destûrê de xuya dibe.

**Niha ji bo destûrekî daimî were nivîsandin, divê ev destûr bi çi rengî be, xalên wê di aliyê qanûnî de ji bo parastina hemû Sûriyan çawa be, herwiha hemû pêkhate divê çawa cihê xwe tê de bigrin, beşdarbûna gelên Sûriyê jî di nivîsandina destûr de xwedî çi girîngî ye? Di heman demê de di destûrên ku têne nivîsandin de, sîstem an jî pergala navendî tên meşandin, lewma li şûna vê sîstemê divê sîstemeke çawa bê meşandin, da ku bibe çareserî ji hemû pirsgirêkan re?**

Wek me got, niha ev danezana destûrî ye an jî destûrekî demkî ye. Lê çi li vir heye, di siberojê de dê destûrekî sabit an jî daimî ji bo Sûriyê bê nivîsandin. Temam, heta em bêjin ku ev destûra ku dê bê amadekirin, destûrekî ye ku li gorî daxwaz û hêviyên gelên Sûriyê y, lê pêwîst e ku em bipirsin, divê ev destûr çawa be? Ger em dixwazin destûrekî rast û dadperwer were nivîsandin, divê komîteya nivîsandina destûrê hemû pêkhateyên Sûriyê, hemû hêz û tevgerên siyasî, civaka sivîl, jin û aliyên din di nav xwe de bigire. Ev yek şertê bingehîn e. Herwiha, pêwîst e ku ev destûr nebe mijara rafirandomê an jî dengdanê ku tenê bi "erê" an "na" were pejirandin. Sûrî welatekî pirrengî ye û gelek pêkhateyên cûda di hundirê wê de hene. Heger tu mijara mafên pêkhateyekê bihêlî ser dengdana hemû gelên Sûriyê, dibe ku ew pêkhate tu carî negihîje mafên xwe. Ji ber vê yekê, ya pêwîst ev e ku mafên hemû pêkhateyan bi rengekî lihevhatinî di hundirê destûrê de bêne naskirin û parastin, ne ku bibin mijara dengdanê. Wekî din dibê ku navê Komarê di vê destûrê de were guhertin û nebe "Komara Erebî ya Sûrî". Ji ber ku dema ku navê welat "Komara Erebî ya Sûrî" tê danîn, wê demê tê têgihiştin ku pêkhateyên din hatine paşguhkirin û ji nasnameya welêt dûr hatine xistin. Ev jî ne rast e û ne li gorî rastiya pirrengiya Sûriyê ye. Di heman demê de pêwîst e ku Sûrî bi rengekî nenavendî were rêvebirin û bibe dewletekî demokratîk, nenavendî û pirrengî. Rêveberiyên herêmî û parêzgehî divê xwedî desthilatên fireh bin û pirtirîn kar, bar û xizmetên civakê di çarçoveya erkên wan de bêne rêvebirin. Divê nebe ku navend hemû desthilat û biryaran di destê xwe de kom bike.

**Girîngiya parastina mafê neteweyî û yê çandî di destûr de çi ye?**

Girîngiya parastina mafên neteweyî û çandî pir mezin e. Di rewşekê wek rewşa Sûriyê de ku di dema rejîma Baasê de tu mafên girêdayî nasnameyên neteweyî û çandî yên pêkhateyên Sûriyê nedihat nasîn û parastin, tenê netewa ereb wek bingehê dewletê dihate dîtin. Di rewşekî wisa de û di dewleteke cihêreng wek Sûriyê de, ji bo ku zilm û binpêkirina mafên pêkhateyan dubare nebin, pêwîst e ku ev cihêrengî di hundirê destûrê de bi awayekî eşkere bê naskirin. Her pêkhateyek divê bi navê xwe bê destnîşankirin û mafên wê yên girêdayî ziman, çand, nasnameya neteweyî, ol û mezheb di hundirê destûrê de bên misogerkirin. Ev mijar nayê hiştin ku tenê bi qanûnên asayî yên ku ji aliyê parlamentoyê an jî serokkomar ve tên derxistin, bê rêvebirin. Berovajî, ji bo ku demokrasî bi rastî pêk were û hemû pêkhate bigihîjin mafên xwe, divê ev maf di asta destûrî de bên parastin û misogerkirin. Ji ber vê yekê, destnîşankirin û pênasekirina van mafan di hundirê destûrê de pir girîng e. Ev maf ne tenê di qanûnên asayî de, lê divê di destûra welat de cih bigirin. Eger ev yek pêk neyê, wê demê gelek pirsgirêk û dozên civakî yên Sûriyê tu carî çareser nebin. Gava ku mafên pêkhateyan di destûrê de neyên misogerkirin, îhtîmala dubarebûna zilm û binpêkirinê hîn jî hebe. Herwiha, dibe ku îhtîmala derketina şer û aloziyên nû di navbera pêkhateyên Sûriyê û desthilatdariyê de dîsa çêbibe. Ji ber vê yekê, avakirina aramî û wekheviya rastîn di Sûriyê de tenê bi rêya destûrekê pêk tê ku mafên hemû pêkhateyan bi awayekî eşkere nas bike û wan biparêze.



# Çawa siyaset dibe amûreke şer, desthilatdarî û berjewendiyan?

Siyaset huner û zanista birêvebirina civakê ye û bi exlaqê civakê ve girêdayî ye. Lê pergala serdest ji bo pêkanîna berjewendiyên desthilatdariyê ew ji cewherê wê qut kirine û xistine xizmeta xwe de, di encamê de bûye sedema rûdana şerên xwînî ku bedelê wê civak dide.

Hemza Sêvo

#### Cewherê siyasetê û çawa hat veguherandin

Dibistanên Yûnanî siyaset bi sinc ve girêdan, tê wateya ku her xebateke siyasî divê di çarçoveya rewiştek baş û sîstemeke bi rêk û pêk de be. Ev xebat jî divê tevlîhevî û pisgirêkan ji bo civakê neafirîne. Lê ev zanist ji cewherê xwe hatiye derxistin, wateyeke giştî lê bûye. Siyaset bi vî rengî hate guhertin heya ku bû hewldanek pragmatîk û pragmatîzm bû taybetmendiya siyasetmedarek serketî.
Bi avabûna împaratorî û dewletan re hem jî bi zêdebûna tevlihevîya rêveberiyê re, têgeha siyasî bi awayekî xwezayî bi şêweyê rêveberiya dewletê ve bû têkildar. Erka zanista siyasî bû lêkolîna polîtîkayên dewletê, mekanîzmayên rêveberiya dewletê, têkiliya di navbera dewlet û civaka wê de herwiha siyaseta wê ya derve. Dewlet polîtîkayên xwe li ser bingeha rêzek faktorên subjektîf û objektîf çêdikin. Siyasetmedar bi her awayî, hem li hundir û hem jî li ser asta navneteweyî, rojevên xwe pêktînin. Her tişt di şopandina van rojevan de rewa tê hesibandin. Zordarî û bikaranîna teşwîq û gefan amûrên ku rêberên siyasî her gava ku ew bikaribin bigihîjin armancên xwe bi hêsanî bi kar tînin.

#### Dema ku siyaset dibe sedema rûdana şeran

Bi dirêjahiya dîrokê re şer ji bo bidestxistina armancên siyasî yên taybetî hatine meşandin. Şer bi gelemperî dema ku rêberên siyasî bi rêya danûstandinan nikarin bigihîjin armancên xwe, tên destpêkirin. Ji ber vê yekê, şer wekî riya duyem û herî guncav û tundûtûj a ku li şûna danûstandinê tê hesibandin, tê de aliyê bihêztir şertên xwe bi hêza çekan ferz dike. Li ser vê bingehê şer bi gelemperî amûra di xizmeta siyasetê de ye. Tevî cudahî û pirbûna teoriyên derbarê sedemên rûdana şeran, di dawiyê de siyaset wekî faktoreke sereke a destpêkirina şeran tê hesbandin. Gelek sedemên rûdana şer hene ku di encamê de tevlîhevî çêdibe, Di serî de hêzên mezin ên hegemon rêya şer hildibijêrin da ku xêr û berhemên gelên welatekî, bi taybetî madeyên xav, rêyên stratejîk û deriyên sînorî bixin bin serweriya xwe. Ev ji bo şerên kolonyal(istimarî) jî derbas dibe. Herwiha hatiye gotin ku ew ji ber armancên olî têne kirin, wekî di rewşa Şerê Xaçperestan de. Lê carcaran şer ji ber sedemên aborî têne kirin an ji ber meyla berfirehbûna serweriyê, an jî ji ber kêmbûna çavkaniyên hin hêzên hegemon. Di heman demê de şer ji ber krîzên navxweyî têne rûdan. Hikumetên ku bi krîzên navxweyî yên giran re rû bi rû dimînin, pir caran hêzeke destwerdankar diafirînin, xeleka reşkirin û êrişan davêjin ser wî dijminê destwerdankar ji bo geşkirina hestên neteweperestiyê û dihêlin tevahiya gel li dijî wî bibe yek. Gelek ramyar û zanyar dibînin ku heta ku mirovahî hebe wê şer û pevçûn berdewam bikin. Hin kes vê ramanê red kirin û tekez dikin ku destpêkirina şeran wekî delîlekî bêedaletiyê û têkçûna mirovahiyê di avakirina pergala ewlehî û aştiyê ya ku cîhanê diparêze de.

#### Ji ber siyasetê her çiqasî şer tên rûdan

Di teoriyên serdemên dîrokî de nirxandinên tekûz li ser şeran hene, hin kes dibêjin bêguman li cîhanê her sed salan carekê şerekî mezin dijî. Lê ev dem bi awayekî gelemperî li ser asta cîhanê nehatiye lihevkirin, hin kes dibêjin ku ew her 500 salan carekê û hin kes dibêjin her 200 salan carekê, hin şîroveyên din jî dibêjin her 100 salan carekê diqewime. Lê bûyerên sedsala bîstan van teoriyên çerxên dîrokî red kirin, ji ber ku di vê sedsalê de du şerên cîhanî yên wêranker rû dan, ev şer jî yên herî xwînî û wêranker di dîroka mirovahiyê de hat naskirin.

#### Siyaset bûye sedema derketina şerên dîrokî û îroyîn

Divê were zanîn dema siyaseta dewletê tê meşandin, êdî desthilatdarî dikeve tevgerê, dema desthilatdarî tê afrandin, rola berjewendî û kapîtalîzmê derdikeve pêş. Krîzên aborî Yekîtiya Sovyetê hilweşandin û di dawiya salên 1980'an de Almaniyayê û bloka sosyalîst hilweşand. Lê avabûna Dewletên Yekbûyî weke yekane hêza cîhanî çênebû tenê piştî têkçûna artêşa Iraqê di Şerê Kendavê yê Duyemîn de ku ji hêla Dewletên Yekbûyî ve di bin serokatiya Serok George Bush de hat rêvebirin. Ev qonaxek taybet bû di dîrokê de, lê di demek dirêj nedomand. Dema ku têkiliyên navneteweyî ji hêla hêzek yekane ve têne serdestkirin, sîstema daristanê ji nû ve tê sazkirin, ewlehî têkdiçe û kaos çêdibe. Sedema rûdana krîza Ukraynayê ji ber xwesteka Rûsya ya siyasî û desthilatdariyê ye. Duh her du şerên cîhanî bûn, di nav de şerên herêmî yên teka teka ku li hin dewletan rû dida. Ji şerê Israîl û Filestîn, Israîl û Lubnan, heya şerê Hind û Pakistan, şerê Korya Bakur û Başûr, şerê Kendava Erebî ya yekem û duyam û hwd… Di dema heyî de em dibînin ku herêm û cîhan bi giştî bi agirê şerê Israîl-DYA û Îranê dişewite, ev şer di çarçoveya şerê cîhanî yê sêyem de ye, asoyên şerê cîhanî yê sêyem bi destpêkirina Buhara Erebî re, hem jî planên hêzên hegemon ên ku piştî sala 2000'î hatine amadekirin. Sedemên van şeran jî ji ber meşandina




siyaseta hêzên serwer ên ku dixwazin bi riya siyasetê armancên xwe bi dest bixin, armancên wan ên sereke tevlîhevî ye, bilindkirina asta aboriya xwe bi riya şer û destwerdanan de, riyên aborî, meşadina cîhanê li gorî siyaseta xwe. Hêza ku di asta herî jorê de bi siyaseteke wiha radibe, Amerîka, Israîl û dewleta Tirk a ku dixwaze bi rêya ola Isalamê serdema Osmanî di gelek welatên Asya, Efrîqa û hwd… vegerîne. Li hêla din jî planên hevbeş ên Israîl û DYA'ê li seranserî cîhanê hene, lê herî zêde di Rojhilata Navîn de tên meşandin. DYA û Israîl dixwazin peymanên Ibarahîmî bi gelek welatên Ereban bidin îmzekirin, ev yek bi rengê siyasî tê kirin, lê paşperdeya wê dagirkirin, serwerî, tevlîhevî, şer, berjewendiyên aborî û meşandina planên rêyên bazirganiyê hene. Binerin çawa siyaset ji bo tevlîheviyê tê meşandin?

#### Di parêznameya 5'an de Rêber Apo çawa siyasetê dinirxîne

Têgîna polîtîkayê jî herî kêm bi qasî têgîna desthilatdariyê diyardeyeke civakî ya têgihiştina wê zehmet temsîl dike. Peyva polîtîkayê bi koka xwe Grekî ye, hem têgîna rêveberiyê hem jî ya desthilatdariyê tîne bîra mirov û tê maneya 'rêveberiya bajêr'. Lê wexta ku weke diyardeyeke civakî behsa wê bê kirin, mirov dikare wê wisa bide naskirin; civak bi awayekî azad tê rêvebirin û pêşxistin, bi vê re ferd ji bo bibe şexsiyet pêş dikeve. Tevî ku diyardeya rêveberiyê di nava xwe de dihewîne jî mirov nikare bi tevahî wê weke rêveberî destnîşan bike. Mirov nikare wê hem bi desthilatdariyê re hem jî bi xwerêvebirinê re wekhev bibîne. Mirov polîtîkayê weke qada azadiya civakê, weke qada afirandinê ya lê pêşxistina mane û îradeyê tê zêdekirin şîrove bike, ev zêdetir nêzî rastiya wê ye. Heta mirov dikare polîtîka û azadiyê wekhev bibîne. Li vir a mewzûbehs ew e, civak hem bi fikir, hem jî bi çalakiyê li xwe û nasnameya xwe serwext dibe, pêşde dibe û xwe diparêze. Dema ku polîtîka bibe erka xwerêvebirinê hingê weke polîtîka demokratîk dibe xwedî nasname, lê dema veguhere rêveberiya desthilatdariyê hingê polîtîka ji rastiya xwe dûr dikeve û dikeve rewşekê ku xwe înkar dike. Qada desthilatdariyê ew qad e ku lê polîtîka tê înkarkirin. Ango, çawa ku lîberalîzm bi israr ferz dike, rêveberiya dewletê polîtîka û rêveberiya polîtîk nîne, berevajî înkara polîtîkayê ye û tê wê wateyê ku li şûna wê yan rêveberiya keyfî ya desthilatdariyê yan jî îdareya bi pîvan a dewletê cih digire. Ti carî nabe ku mirov îdareya dewletê weke polîtîkayê bide naskirin. Ji ber ku ew bi awayekî desthilatdariya bi pîvan û nerm e. Desthilatdarî jî di her rewşê de tê maneya li dervehiştina polîtîkayê. Di civaknasiyê de yek ji qada têde aloziya têgînan heye, qada têkiliyên desthilatdarî, rêveberî û polîtîkayê ye. Têgîn ew çend di nav hev de û mîna wekhev bin têne bikaranîn, banê tevahiya civaknasiyê zincîrwarî bi awayekî şaş tê deribandin. Zanista civakî ya îlhama xwe ji îdeolojiya lîberalîzmê digire bi awayekî berfireh di warê tevlîhevkirina mejiyê mirovan de xizmetê dike. Nexasim ji tevahiya çalakiyên sîstemên tehekumkar re polîtîka dibêje, bermahiyên piçûk ên polîtîkayê yên li ser piyan mane ji nedîtî ve tê; weke rêveberiyên eşîran ên destpêkê, mehelleparêziya teng, demdirêj pêşiya xwe nedîtin, temsîlnekirina berjewendiyên bingehîn ên neteweyî yên hundir û derve, bi nav dike û hukim di heqê wan de dide. Di vê mijarê de têra xwe alozî heye, û mejiyê mirovan tevlîhev e. Tevî ku polîtîka ji mêj ve ji civakê hatiye qewitandin û li şûna wê şîfreyên desthilatdariyê yên bi xiyanetê re wekhev hatine ferzkirin, dîsa jî dikarin bi gewîtî bibêjin di warê polîtîkayê de gelekî pêşketin hene, di polîtîkayê de gihiştine asteke şareza û modern. Lê ya rastî, li qada civakî ya polîtîka lê heye, ya xwedî nirx berjewendiyên heyatî yên civakê ne; xweşhaliya wê û asta pêşketina wê ya manedan û avabûnê ye. Civakên bêpolîtîka yan jî polîtîkayên wan qels, yan wê ji derve ji aliyê desthilatdariyekê ve bêne îmhakirin û bibin mêtingeh an jî ji hundir ve wê ji aliyê elîteke desthilatdariyê û çîneke mêtinkar ve zordestiyê bibînin û bêne mêtin. Qenciya herî mezin a mirov bi civakekê bike ew e, divê mirov asta polîtîk a wê civakê bilind bike. Ji vê jî ya qenctir ew e, divê mirov civakê bigihîne demokrasiyeke 24 saetan dewamî dixebite û bigihîne demokrasiyeke avabûyî û bicihbûyî.



Pêjder Altan

## DYA-Îsraîl çima careke din wê êrişê ser Îranê biceribîne?

Pêvajoya ku bi taybetî piştî 7'ê Cotmehê, şerê Xezeyê, dorpêçkirina Îranê, êrîşên li ser hêzên wekîl ên herêmî û tevgerên leşkerî yên DYA-Îsraîlê ku piştî 28'ê Sibatê xuya bûn, nîşan dane ku serdemek nû ya pevçûnê li Rojhilata Navîn dest pê kiriye. Lêbelê, gelo vê pevçûnê encama hêvîkirî derxistiye holê an na, hêjayê nîqaşê ye. Bi salan, beşek girîng a hesabên stratejîk ên ku li ser DYA û Îsraîlê disekinin, li ser hêviya dorpêçkirina Îranê, qelskirina hêzên wekîl ên wê, zêdekirina zexta navxweyî bi rêya cezayên aborî û di dawiyê de şikandina rejîmê ji hundir ve bû. Îranê qadeke berfireh a bandorê ava kiribû ku ji Lubnanê heta Iraqê, ji Sûriyeyê heta Yemenê dirêj dibû û ev qada bandorê ji bo ewlehiya Îsraîlê, hevsengiya li Kendavê û planên herêmî yên DYAyê bûye pirsgirêkek bingehîn. Ji ber vê yekê, zexta li ser Îranê ne tenê siyasetek sînorkirî li dijî welatekî bû, mijarek stratejîk bû ku rasterast bi ji nû ve avakirina Rojhilata Navîn ve girêdayî bû. Lêbelê, tevî hemî cezayan, zexta leşkerî, kuştinan, hedefgirtina hêzên wekîl û pevçûnên rasterast, avahiya siyasî û rêxistinî ya Îranê negihîşt asta ku dihat hêvîkirin. Îran qels bû, cîhê wê yê manewrayê teng bû û hin pozîsyon winda kir, lê rejîm neguherî, avahiya dewletê hilweşiya û welat ji hevkêşeya herêmî nehat derxistin. Ev rewş ji bo têgihîştina nîqaşên nû yên ku vê dawiyê derketine holê pir girîng e. Ji ber ku entegrasyon, vejandina dewletê, aramiya herêmî, sîwanên ewlehiyê û lêgerîna mîmariyên nû yên ku îro têne nîqaş kirin ne tenê wekî berdewamiya stratejiyek serkeftî, lê di heman demê de wekî hesabkirinek nû piştî ku Îran wekî ku dihat hêvîkirin neşikest, derket holê, dikare were xwendin. Di vê nuqteyê de, divê nêzîkatiya DYA û Brîtanya ya herêmê jî ji nû ve were nirxandin. Xeta DYA ku demek dirêj e eşkere ye, bi taybetî balkişandina wê ya li ser ewlehiya Îsraîlê, hevgirtina wê ya sermayeya Kendavê bi kapasîteya teknolojîk û leşkerî ya Îsraîlê re û armanca wê ya normalîzekirina herêmî bi rêya Peymanên Birahîmî, ji aliyekî din ve, ramana stratejîk a Brîtanî xwedî kevneşopiyeke jeopolîtîk a nermtir e ku li ser bingeha berdewamiya statuya kevin e ku di dîrokê de Tirkiyeyê ji hevkêşeya Rojhilata Navîn dernexistiye û eksena Sûriye-Iraq-Tirkiyeyê li ser pîvana Levant û Mezopotamyayê nirxandiye. Rewşa heyî hem rageşî û hem jî îhtîmala lihevkirinek qismî di navbera van her du nêzîkatiyan de nîşan dide. Fikra rêziknameyek yekqutbî ya ku navenda wê Îsraîlê ye, bi tena serê xwe têrê nake ji ber ku hewce ye pêşî li qelsbûna Îranê û avahiya tevlihev a herêmê were girtin. Ji ber vê yekê, nêzîkatiyên pir-stûnî yên ku Tirkiye, Kendav û Îsraîlê di heman mîmariyê de dihesibînin, bêtir xuya dibin. Belgeyek ku wekî rapora "Sê Stûn" tê zanîn îro bi berfirehî tê nîqaş kirin. Pêdivî ye ku were ravekirin ka nêzîkatiya Sê Stûnî ku li vir pir caran tê behs kirin, çi temsîl dike. Ev nêzîkatî li ser wê texmînê ye ku di salên dawî de di hin derdorên stratejîk û navendên ramanê yên Amerîkî de hatiye nîqaş kirin ku Rojhilata Navîn dikare ne bi rêya hêzek hegemonîk a yekane, lê bi rêya sê stûnên bingehîn ên herêmî yên ku hevûdu temam dikin were stabîlkirin. Di vê çarçoveyê de, Îsraîl wekî hilgirê ewlehî, teknolojî û kapasîteya leşkerî tê hesibandin; Dewletên Kendavê hilgirê sermaye, darayî û hêza aborî ne; û Tirkiye hilgirê cihê jeopolîtîk, kapasîteya leşkerî, korîdorên veguhastinê û bandora herêmî ye. Mantîqa bingehîn a vê nêzîkatiyê li ser wê texmînê ye ku wekî çawa ku krîzên bîst salên dawî nîşan dane, Rojhilata Navîn êdî nikare tenê bi destwerdanên leşkerî an guhertinên rejîmên derveyî were birêvebirin.
Lêbelê, pirsa krîtîk li vir ev e ku gelo nêzîkatiya Sê Stûnan bi rastî armanc dike ku rêjeyek herêmî ya hevseng û pir-qutbî be, an jî ew formulasyonek cûda ya modelek hegemonîk a nû ye ku li ser ewlehiya Îsraîlê disekine? Bersiva vê pirsê dê di têgihîştina cewhera mîmariya nû ya ku li Rojhilata Navîn derdikeve holê de diyarker be.



# Qanûna Bicihkirina Mecbûrî ya 1934'an; Planeke nayê jibîrkirin

Qanûna Bicihkirinê ya Mecbûrî qanûneke Komara Tirkiyê ye ku di 14'ê Pûşpera 1934'an de bi hejmara 2510'an hate pejirandin. Armanca bingehîn a vê qanûnê, asîmîlasyona gelên ne-tirk bi taybetî Kurdan û guhertina demografiya Kurdistanê bû.

Navenda Nûçeyan

Ev qanûn wekî yek ji pênasên herî girîng ên "Plana Islahata Şerqê" (Plana Çaksaziya Rojhilat) tê qebûlkirin.

#### Xalên bingehîn ên qanûnê

Li gorî vê qanûnê, Tirkiye li ser sê herêman (zoman) hate dabeşkirin:
Herêma 1'emîn: Cihên ku nifûsa wan a çandî ya tirkî diviyabû bihata zêdekirin. Ev herêm ji bo cîhkirina kesên bi eslê xwe tirk bûn.
Herêma 2'emîn: Cihên ku ji bo asîmîlekirina nifûsa ne-tirk hatibûn diyarkirin. Kurdên ji herêma sêyemîn dihatin koçberkirin, li gund û bajarên tirkan ên li rojavayê welat di nav nifûsa tirk de hatin belavkirin da ku di nav demê de winda bibin.
Herêma 3'emîn: Cihên ku ji ber sedemên ewlehî, siyasî û leşkerî ji bo jiyanê hatibûn qedexekirin. Ev der bi piranî herêmên çiyayî û stratejîk ên Kurdistanê bûn ku vala hatin kirin.

#### Encamên siyasî û civakî

Koçberiya bindest: Bi hezaran malbatên Kurd, bi darê zorê ji axa bav û kalên xwe hatin dûrxistin û ber bi herêmên cuda yên Anadoluyê ve hatin sirgûnkirin.
Asîmîlasyona çandî: Qanûnê qedexeyên tund li ser bikaranîna ziman, çand û nasnameya kurdî ferz kir. Bi vî rengî, polîtîkayeke fermî ya "tirkkirinê" hate meşandin.
Têkbirina sîstema eşîrtiyê: Ji bo ku hêza civakî û serhildanên Kurdan were şikandin, serokên eşîran û malbatên bibandor bûn armancên sereke yên koçberkirina mecbûrî.
Ji bo ku em bandora vê qanûnê çêtir fêm bikin, girîng e em li ser herêmên hatine armancgirtin û her weha têkiliya wê ya rasterast bi Serhildan û Komkujiya Dêrsimê re bisekinin.

#### 1. Bajar û herêmên ku herî zêde bandor dîtin

Qanûna 2510'an bi taybetî herêmên ku serhildan lê çêbûbûn an jî potansiyela wan a berxwedanê hebû armanc girt:
Herêma Serhedê û Botanê: Bajarên mîna Agirî, Wan, Bidlîs, Sêrt, Colemêrg û Mûşê ketin bin bandoreke giran. Malbatên serokên eşîran, şêx, mela û kesên xwedî bandor yek bi yek hatin tespîtkirin û ber bi bajarên rojavayê Anadoluyê (mîna Îzmir, Manisa, Bursa, Aydin û Denîzliyê) ve hatin sirgûnkirin.
Qedexekirina çandiniyê: Li gelek deverên çiyayî yên wekî navçeyên navbera Amed, Çewlik (Bingöl) û Dêrsimê, gund hatin valakirin û çûna wan herêman wekî "herêmên qedexekirî" hate ragihandin. Heta bi salan destûr nedan ku tu kes li wir çandiniyê bike an heywanan xwedî bike.



#### 2. Têkiliya qanûnê bi Komkujiya Dêrsimê re (1937-1938)

Qanûna Bicihkirinê ya Mecbûrî ya sala 1934'an, bingeha qanûnî û felsefî ya Komkujiya Dêrsimê amade kir. Têkiliya wan bi vî rengî ye:
Rapora Îsmet Înönü (1935): Piştî derketina qanûnê, Serokwezîrê wê demê Îsmet Înönü çû serdana herêmê û raporek amade kir. Di raporê de hat gotin ku "Dêrsim birîneke biêş e û divê bi operasyoneke leşkerî û koçberkirina mecbûrî were çareserkirin."
Qanûna Tunceliyê (1935): Li ser bingeha Qanûna Bicihkirinê, di sala 1935'an de qanûneke taybet ji bo Dêrsimê hate derxistin. Navê Dêrsimê kirin "Tunceli" û rêveberiyeke leşkerî (Koma Giştî ya Çaremîn) lê hate avakirin. Armanc ew bû ku herêm bi tevahî radestî artêşê bibe da ku Qanûna Bicihkirinê bi cih bîne.
Sirgûnkirina Mezin a Dêrsimê: Piştî ku operasyonên leşkerî di salên 1937-1938'an de bi dawî bûn, bi hezaran mirovên ku ji komkujiyê filitîn, li gorî xalên Qanûna Bicihkirinê ya Mecbûrî, li ser wagonên hesindêr (trênan) li bajarên rojavayê Tirkiyeyê hatin belavkirin. Li gundên ku lê hatin bicihkirin, qedexe bû ku du malbatên Kurd nêzî hev bijîn da ku asîmîlasyon lez bibe.
"Keçên windakirî yên Dêrsimê": Wekî perçeyek ji vê polîtîkaya asîmîlasyonê, bi sedan keçên piçûk ên Dêrsimî ji malbatên wan hatin standin û wekî "zarokên xwedîkirî" dan malbatên efserên tirk ên leşkerî da ku bi çand û zimanê tirkî mezin bibin.
Şert û mercên jiyanê yên Kurdên ku piştî qanûna 1934'an û bûyerên Dêrsimê (1937-1938) ber bi rojavayê Anadoluyê ve hatin sirgûnkirin, pir giran û tije zehmetî bûn. Dewletê polîtîkayeke tund a kontrolê û asîmîlasyonê li ser wan meşand.

#### Xalên sereke yên jiyana wan a li sirgûnê ev bûn:

#### 1. Parçekirina Malbat û Eşîran (Polîtîkaya Belavkirinê)

Qedexeya Hevşiyarbûnê: Ji bo ku Kurd nebin yek û çanda xwe neparêzin, qedexe bû ku du malbatên sirgûnkirî di heman gundî an jî di heman taxê de bijîn.
Rêjeya nifûsê: Li gorî rêbazên fermî, nifûsa Kurdan a li gund an navçeyên rojavayê welat nedibû ku ji %10'ê nifûsa giştî ya wî cihî derbas bike. Malbatên ku li ser herêmên mîna Îzmir, Bursa, Aydin, Manisa û Ispartayê hatin dabeşkirin, bi tenê serê xwe di nav civakek bi giranî Tirk de man.

#### 2. Qedexeyên ziman û çandê

"Bi Tirkî Biaxive!": Li herêmên ku Kurd lê hatin bicihkirin, axaftina bi kurdî di cihên giştî de (wek bazar, şaredarî û dibistanan) bi tundî hate qedexekirin. Kesên ku bi kurdî diaxivîn, dihatin cezakirin an jî ji aliyê cerdevan û polîsan ve rastî tundiyê dihatin.
Guhertina Navan: Navên kurdî yên malbatan, navên eşîran û her weha navên zarokan hatin qedexekirin. Li gorî Qanûna Paşnavan, paşnavên bi tirkî yên ku tu têkiliya wan bi koka wan re nîne (wekî Öztürk, Yılmaz, Doğru) li wan hatin kirin.

#### 3. Kontrola polîsî û qedexeya rêwîtiyê

Îmzaya mecbûrî: Kurdên sirgûnkirî wekî "kesên gumanbar" dihatin dîtin. Diviyabû ku her hefte an her meh herin qereqolên cendermeyan an polîsan û îmzayê bidin da ku îspat bikin ku wan herêm neterikandiye.
Qedexeya derketina ji bajar: Bêyî destûra fermî ya walî an jî qeymaqam, çûna bajarên din an vegera li Kurdistanê bi temamî qedexe bû. Kesên ku bê destûr ji cihê xwe diçûn, dihatin girtin û dîsa bi darê zorê dihatin vegerandin.

#### 4. Zehmetiyên aborî û civakî

Pirsgirêka xanî û erd: Dewletê soz dabû ku erd û xaniyan bide koçberan, lê di pratîkê de gelek malbat di şert û mercên pir xirab de, di tewîlan (axur), xaniyên rûxandî an jî konan de man.
Biyanîbûn û nijadperestî: Ji ber ku dewletê Kurdên sirgûnkirî wekî "serhildêr" û "ewlehiya neteweyî xirab dikin" nîşan dabû, gelê herêmê yê tirk bi guman û carna jî bi dijminatî nêzî wan dibû. Vê yekê dîtina kar û peydakirina nanê rojan hîn ȷartir dikir.

#### 5. Guhertina qanûnê û vegera li ser axê (1947)

Ev şert û mercên giran heta piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn berdewam kirin. Di sala 1947'an de, bi guhertina qanûnê û lawazbûna pergala yek-partiyî (CHP), qedexeya vegerê hate rakirin. Gelek malbatên Kurd piştî nêzî 10-13 salên sirgûnê, mal û milkên xwe yên li rojava firotin û her tiştî li pey xwe hîştin da ku vegerin ser axa bav û kalên xwe ya li herêmê, her çend gelek gundên wan hatibûn rûxandin an jî ketibûn destê kesên din.

Raporên veşartî yên serok û rayedarên dewletê yên salên 1930'an, rûyê herî rût û rasteqîn ê polîtîkayên dewletê yên li ser Kurdistanê û Qanûna Bicihkirinê nîşan didin. Ev raporên ku ji bo raya giştî hatibûn veşartin, nexşeya rê ya asîmîlasyon û sirgûnê dihewandin.

#### Di vê serdemê de sê raporên herî girîng û bibandor hene:

#### 1. Rapora Şerqê ya Îsmet Înönü (1935)

Serokwezîrê wê demê Îsmet Înönü, di sala 1935'an de diçe herêmê û raporeke taybet ji bo Mistefa Kemal Atatûrk amade dike. Xalên herî girîng ên vê raporê ev in:
Tirkkirina bajarên sînor: Înönü dibêje ku divê nifûsa Tirk a li bajarên wekî Wan, Bidlîs û Qersê bi lez were zêdekirin. Ew pêşniyar dike ku koçberên tirk ên ji Balkanê bînin û li van deran bi cih bikin.
Ji bo Dêrsimê hişyarî: Di raporê de tê gotin ku Dêrsim herêmeke wisa ye ku hikûmet nikare bikeve navê û dibêje: "Dêrsim birîneke pîs e, divê em bi bernameyeke leşkerî ya nêzîk re rû bi rû bimînin û nifûsa wê belav bikin."
Plana asîmîlasyona gundan: Pêşniyar dike ku li gundên kurdan dibistanên şevînî yên tirkî (YÎBO) werin vekirin da ku zarok ji malbatên xwe werin qutkirin û bi tirkî mezin bibin.

#### 2. Rapora Celal Bayar (1937)

Celal Bayar, ku piştî Înönü bû serokwezîr, raporeke din a veşartî amade kir. Nêzîkatiya Bayar hinekî bêtir li ser aboriyê bû lê armanc heman bû:
Girtina rêyên aborî yên Kurdan: Bayar diyar dike ku heke Kurd ji aliyê aborî ve bi hêz bibin, dê daxwaza serxwebûnê bikin. Ji ber vê yekê, ew pêşniyar dike ku kargeh, rêyên hesinî û veberhênanên mezin tenê li cihên ku nifûsa wan tirk e werin kirin.
Polîtîkaya "Zimanê Tirkî": Di raporê de tê gotin ku li bajaran bazirganî tenê bi tirkî were kirin û kesên ku bi kurdî dipeyivin ji jiyana aborî werin dûrxistin.

#### 3. Rapora Mufetişê Giştî Abidin Özmen (1936)

Abidin Özmen ku wekî Mufetişê Giştî yê Herêmê kar dikir, raporeke pir hûrgulî li ser demografiya Kurdistanê amade kir:
Dabeşkirina Eşîran: Özmen lîsteya hemû eşîr û malbatên kurd ên xwedî bandor derxist. Di raporê de hat destnîşankirin ku kîjan malbat "xetere" ye û divê di bin kîjan şertan de ber bi rojavayê Tirkiyê ve were sirgûnkirin.
Rêbazên çavdêriyê: Wî pêşniyar kir ku li her gundekî sîxur û cerdevan werin danîn da ku her tevgereke Kurdan rasterast ji Enqereyê re were ragihandin.

#### Armanca giştî ya raporên veşartî

Ev rapor hemû nîşan didin ku Qanûna Bicihkirinê ya sala 1934'an ne qanûneke asayî ya koçberiyê bû; berovajî wê, projeyeke endezyariya civakî û demografîk a pir sîstematîk bû ku armanc dikir nasnameya kurdî bi temamî ji holê rake.
Me xwest em vê mijarê bi agahiyên heyî û parvekirî kom hev bikin û weke lêkolînekê li ser vê pilanê binivisînin.